نەهەمین کۆنفرانسێ زانستییێ ناڤدەولەتییێ

سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

ئەفسانەیا کوردی

ئەدەب، زمان، دیرۆک و جڤاک

٢٢-٢٣ێ نیسانا ٢٠٢٥ێ

المؤتمر الدولي العلمي التاسع لمركز الدراسات الكُردية

الأسطورة الكُردية

الأدب، اللغة، التاريخ والمجتمع

٢٢-٢٣ نيسان ٢٠٢٥

نهمین کنفرانس علمی بین المللی مرکز مطالعات کردی زاخو

افسانه‌های کردی

ادبیات، زبان، تاریخ و جامعه

٢٢ ـ ٢٣ آوریل ٢٠٢٥

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

# ئەفسانەیا کوردی

## ئەدەب، زمان، دیرۆك و جڤاك

**الأسطورة الكُردية** | **افسانەهای کردی**

الأدب، اللغة، التاريخ والمجتمع | ادبيات، زبان، تاريخ و جامعه


کۆمەکا ڤەکۆلەران

مجموعة باحثين

**پێشکێشکرن | التقديم**

پ. د. حسين عثمان عبدالرحمن

# سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی


| | |
|---|---|
| پەرتووک | **ئەفسانەیا کوردی**<br>ئەدەب، زمان، دیرۆک و جڤاک |
| ژ نڤیسینا | کۆمەکا ڤەکۆلەران |
| بەرگ | بەرگێ ئێکێ ٢٠٢٥ |
| دستەکا دیزاینێ | دلـژین شـەریف یوسـف<br>ئـامـەد موحەممەد عەبدوللا<br>رانیا عەبدولرەزاق موحەممەد<br>هێلان تـەوفیق ئیسمـاعیل<br>هـێژا فـــاخـــر سەعید<br>دلـژین مـستـەفا یوسف |
| سەرپەرشتیا دیزاینێ و بەرگ | وارهـێـل عـەبدولبـاقی<br>شـرین غـەریب سـالـح |
| ڕێکخەر | پـالـە عیسـا |
| ISBN | ٩٧٨- ٩٩٢٢- ٦٦١- ٦٣- ٠ |
| ژمارەیا سپاردنێ | D- \ ٢٦٠٤ \ ٢٥ |



© مافێ چاپێ یێ پاراستیە بۆ
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی



Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

zcks@uoz.edu.krd +964 (0)751 536 1550
Iraq-Kurdistan Region, Zakho- Univesity of Zakho

پەخشان سابیر حەمەد
حسين عثمان عبدالرحمن
دارا حەمید محەمەد
سەردار احمد گەردی
عبدالسلام نجم الدين عبدالله
عماد ويسى خالد
عيماد عبدالقادر محمد سعيد
فرست مرعي
کەیفی ئەحمەد عبدالقادر
محسن عارف صالح رشيد
هیوا کەریم حسێن
هەڵمەت بایز ڕەسوڵ
فرهاد عزيز حسن
مولود ابراهيم حسن
ڕۆژگار محمد صابر
ڕێبوار محمد اسماعيل
ڕێبین خلیل قادر
زريان جيزنى محمد
ژڤان نەعمان حەجی
سەلوا فەریق سالح
شورشڤان عادل احمد
ڤیان عباس  اسماعيل
محمد احمد حسن
مكنون محمد طاهر مقداد
ناز ئەحمەد سەعید
نيژيار نعمان نعمان
هەژار ئەحمەد عەبدولغەفوور
ئەڤین ئاسۆس حەمە
امير مسطو محمد
ڕزگار عبدالله احمد
سۆران عبدالرحمن حمد
سەرباز مەجید خۆشناو
سەعد قازی
شنۆ عەولا حەمەدئەمین
صديق اورحمان على
عبدالباسط سيدا
گەهین نزار ابراهيم
نعمه ڤرندی اسماعيل
نەزیرە صابر مصطفى
هێمن کەریم
هەرێم عوسمان

هەژار فەقێ سلێمان حسێن
یەهمان محمد عبدالرحمن
ئەڤراز سلێمان حاجي
ئیبراهیم خەلیل فەتحوڵڵا
پیشڕەو عبدالله حمه غريب
ثريا احمد عبدالله
خيري الياس علي ال عيسو (خيري بوزاني)
داستان طه عبدالله حمو
دلێر كمال أحمد
ژینۆ عەبدولڕەحمان محەمەد
ژیهات قادر حەسەن
سازان صباح پیریاڵ
ساكار كامل
سميه محمدى
شمال خمو خضر
عبدالخالق سلطان محمود
على عجيل موسى
فرزانه هدايتى زاده
فۆڕات تەوفیق ئەبوزەید (کوردزاده)
کۆڤان ڕێسان حەسەن
کۆڕەک على احمد
لقمان محمود ڤاسم
مجاهد عزيز عبدالرزاق
مردان رفعت ابوزيد
ميديا مراد محمدامين
مەزهەر ئیبراهیمی
هانا هدايتى زاده
هلز رشيد حسين
هودا سلێمان پێرموس
هێرۆ کەمال کەریم
هەدار سەفەری محەممەد
هەندرێن مهدی احمد (هەندرێن)
وحيد نعمت رمضان

Haşım ÖZDAŞ
Mesut Düzce
Nurettin ÇİFTÇİ
Ayhan YILDIZ
Elif Gemicioğlu Yaviç
Baroj Hashim Abdi
Baroj Hashim Abdi

بشتی هەلبژارتنا ڤەکولینان ژ لایێ لیژنەیا زانستیڤە، لیژنەیا ژێری ب کارێ سەرپەرشتی و ئامادەکرنا ڤەکولینان ژ بینخەمەت دیزاینکرن و بەلاڤکرنێ ڕابوو. لیژنە ژ ئەڤان بەرێزان پێکهاتییە:

١. عەبدولسەلام نەجمەدین عەبدوللا

٢. حسین عثمان عبدالرحمن

٣. نزار ئەیووب حەسەن

٤. فاخر حەسەن یوسف

٥. ماجد محەمەد یونس

٦. هوکر تاهر تەوفیق

ئەڤ پەرتووکە (ئەفسانەیا کوردی ئەدەب، زمان، دیرۆک و جڤاک) کۆمەکا ڤەکولینان ب خوڤە دگریت، کو بۆ ئەهەمین کۆنفرانسێ ناڤدەولەتییێ سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکولینێن کوردی یا سەر ب کۆلیژا زانستێن مروڤایەتیڤە ل زانکۆیا زاخۆ، ل ڕۆژێن ٢٢ و ٢٣ێ نیسانا ٢٠٢٥ێ هاتینە پێشکێشکرن. ڤەکولینێن گەهشتینە کۆنفرانسێ ژ لایێ لیژنەیا زانستیڤە هاتینە هەلسەنگاندن و ڤەکولینێن هەژی بۆ بەلاڤکرنێ هاتینە دەستنیشانکرن. لیژنەیا زانستییا کۆنفرانسێ ژ ئەڤان بەرێزێن ل خوارێ پێکدهێت:

## لیژنەیا زانستی:

| ناڤ | زانکۆ | لیژنە |
|---|---|---|
| پ.هـ.د.فاخر حسن یوسف | زانکۆیا زاخۆ- هەرێما کوردستان/ عیراق | سەرۆکێ کۆنفرانسی |
| پ.د.عبدالسلام نجم الدین عبدالله | زانکۆیا زاخۆ- هەرێما کوردستان/ عیراق | سەرۆکێ سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی |
| پ.د.حسین عثمان عبدالرحمن | زانکۆیا زاخۆ- هەرێما کوردستان/ عیراق | سەرۆکێ لیژنەیا زانستی |
| پ.د.هوگر طاهر توفیق | زانکۆیا زاخۆ- هەرێما کوردستان/ عیراق | ئەندام |
| پ.هـ.د. نزار ایوب حسن | زانکۆیا زاخۆ- هەرێما کوردستان/ عیراق | ئەندام |
| پ.هـ.د.ماجد محمد یونس | زانکۆیا زاخۆ- هەرێما کوردستان/ عیراق | ئەندام |
| پ.هـ.د.سلوی فریق صالح | زانکۆیا زاخۆ- هەرێما کوردستان/ عیراق | ئەندام |
| پ.هـ.د.پیمان محمد عمر | زانکۆیا زاخۆ- هەرێما کوردستان/ عیراق | ئەندام |
| پ.هـ.د.لبرین عبدالله زانکۆیا زاخۆ | زانکۆیا زاخۆ- هەرێما کوردستان/ عیراق | ئەندام |
| پ.د.ابوعبید عبدالله ذیاب | زانکۆیا دهۆک- هەرێما کوردستان/ عیراق | ئەندام |
| پ.د.عیماد ویسی خالد | زانکۆیا دهۆک- هەرێما کوردستان/ عیراق | ئەندام |
| پ.د.محسن عارف صالح | زانکۆیا دهۆک- هەرێما کوردستان/ عیراق | ئەندام |
| پ.هـ.د.کامران ابراهیم خلیل | زانکۆیا دهۆک- هەرێما کوردستان/ عیراق | ئەندام |
| پ.هـ.د.حلیما خورشید | زانکۆیا دهۆک- هەرێما کوردستان/ عیراق | ئەندام |
| پ.هـ.د. پروین رووف هادی | زانکۆیا دهۆک- هەرێما کوردستان/ عیراق | ئەندام |
| پ. د.فرهاد عزیز حسن | زانکۆیا سەلاحەددین- هەرێما کوردستان/ عیراق | ئەندام |
| پ.د.اسماعیل شمس | زانکۆیا تەباتەبایی - ئیران | ئەندام |
| د.مهری پاکزاد | زانکۆیا مهاباد - ئیران | ئەندام |
| پ.هـ.د.یاشار کاپلان | زانکۆیا هەکاری - تورکیا | ئەندام |
| پ.هـ.د.ئیلیاس نوردین هاجی سوڤاچی | زانکۆیا هەکاری - تورکیا | ئەندام |
| د. ئەنگین عەبدوللا سالح کورکمز | زانکۆیا هەکاری - تورکیا | ئەندام |
| پ.هـ.د.کەنعان سوباشی | زانکۆیا مێردین ئارتوکلویێ - تورکیا | ئەندام |
| پ.هـ.د. موستەفا ئاسلان | زانکۆیا مێردین ئارتوکلویێ - تورکیا | ئەندام |
| پ.هـ.د. هکمەت ئاتلی | زانکۆیا مێردین ئارتوکلویێ - تورکیا | ئەندام |
| پ.هـ.د. شاهاب ڤالی | زانکۆیا مێردین ئارتوکلویێ - تورکیا | ئەندام |
| پ.هـ.د. میکاییل بۆلبۆل | زانکۆیا مێردین ئارتوکلویێ - تورکیا | ئەندام |
| د.احمد سعید السید زیدان | زانکۆیا دمنهور- کۆمارا مسرێ | ئەندام |
| پ.د. محمد الطاهر بنادي | زانکۆیا بسکرة - کۆمارا جەزایر | ئەندام |
| د. سیف الله ملا جان | زانکۆیا ملی- تاجیکستان | ئەندام |
| د. کریمي عبدالکریم | شانشینا مەغرب | ئەندام |
| د. عبدالمجید شێخۆ | زانکۆیا عەفرینێ - سووریا | ئەندام |
| م. ئاراس هسۆ | زانکۆیا کۆبانیێ - سووریا | ئەندام |
| م.ڤەریدا براهیم | سازیبا زمانێ کوردی - سووریا | ئەندام |
| Dr. Farangis Ghaderi | University of Exeter, UK | Member |
| Keivan Simetgo-Simko | University of west Attica | Greece |

لیژنیا ئامادەکار:

| لیژنە | زانکۆ | ناڤ |
|---|---|---|
| سەرۆک | زانکۆیا زاخۆ | پ.د.ماجد محمد یونس |
| ئەندام | زانکۆیا زاخۆ | د.شۆرشفان عادل احمد |
| ئەندام | زانکۆیا زاخۆ | د.هزار عبدالله حسین |
| ئەندام | زانکۆیا زاخۆ | د.محمد عباس حمید |
| ئەندام | زانکۆیا زاخۆ | د.کاروان صالح ویسی |
| ئەندام | زانکۆیا زاخۆ | پ.د. خورشید محمد رشید احمد |
| ئەندام | زانکۆیا زاخۆ | م.دلیر کمال احمد |
| ئەندام | زانکۆیا زاخۆ | م.وارهیل عبدالباقی کامل |
| ئەندام | زانکۆیا زاخۆ | م.سلیمان شفیق توفیق |
| ئەندام | زانکۆیا زاخۆ | م.مجاهد عزیز عبدالرزاق |
| ئەندام | زانکۆیا زاخۆ | م.ژیهات قادر حسن |
| ئەندام | زانکۆیا زاخۆ | م.عمر عبدالرحمن |
| ئەندام | زانکۆیا زاخۆ | م.یاله عیسی جبو |
| ئەندام | زانکۆیا زاخۆ | م.واهیل عمر اسماعیل |
| ئەندام | زانکۆیا زاخۆ | م.لقمان محمد قاسم |
| ئەندام | زانکۆیا زاخۆ | م.محمد حجی حمید |
| ئەندام | زانکۆیا زخۆ | م.نزار طاهر صادق |

## ناڤەرۆك


| | | |
|---|---|---|
| پێشگۆتن | پ.د. حسین عثمان عبدالرحمن | ١٩ |
| مۆدێلا تاکگەراییا قەهرەمانا ژن د ئەفسانەیا "دندك هنارێدا" ل دویڤ مۆدێلا "مۆرین مۆرداک"ێ | پ.د. حسین عثمان عبدالرحمن<br>پ.د. عبدالسلام نجم الدین عبدالله | ٢٣ |
| گەشتی پاڵەوان لە ئەفسانەی ئینانا و شاماراندا | ئیبراهیم خەلیل فەتحوڵلا | ٦٩ |
| کوور.دیلمون.کی ([illegible]) ئەفسانەی بەهەشتی سۆمەری | پ.هـ.د.فرهاد عزیز حسن<br>پ.د.مولود ابراهیم حسن | ١٠٣ |
| ئەفسانەی کوردی وەک هەنگاوی یەکەم بەرەو مەعریفە | پ.ی.د. محمد احمد حسن | ١٢٩ |
| تراژیدیای ناشادیی بوونایەتیی لە نێوان مەم و زینی خانی و ئەفسانەی تراژیدی یۆنانیدا | پ. د. هەڵمەت بایز ڕەسوڵ<br>م. هەندرێن مهدی احمد (هەندرێن) | ١٥٣ |
| ئیستاتیکایا رویدانێ د ئەفسانەیا کوردیدا ئەفسانەیا (لاوێ بەهدینی) وەك نموونە | پ. هـ. د. مکنون محمد طاهر مقداد | ١٨٥ |
| ئەفسانە و جێگرەوەی ئەفسانە لە حیکایەتی کوردیدا | د. سەرباز مەجید خۆشناو | ٢٠٩ |
| تێما لە ئەفسانەی کوردیدا (هێلکەی نامێ) بە نموونە | د. نعمە قرەنی اسماعیل | ٢٤١ |
| خواندنەکا ڕەخنەیی بۆ ئەفسانا(کولۆخك) ل دویڤ بنەمایێن تیۆرا ڕەخنەیا ئەفسانەیی | م. هـ. هودا سلێمان پێرموس | ٢٦٩ |
| جوانناسی خەیاڵ لە ئەفسانەی کوردیدا (ئەفسانەکانی سیحر وجادوو) بەنموونە | م. ی. ڤیان عباس اسماعیل<br>پ. ی. د. ڕێبوار محمد اسماعیل | ٢٩٥ |
| ئەزموون و بنیاتی وێنەی ئاوەزی لە ئەفسانەی کوردیدائەفسانەکانی (شەوی گافارەوەکۆڵ و چەند ئەفسانەیەکی) گەرمیان بەنموونە | پ. د. دارا حەمید محەمەد | ٣١٧ |
| تایبەتمەندییەکانی ئەفسانەی کوردیی خۆراسان | د. صدیق اورحمان علی<br>م. هـ. ثریا احمد عبدالله | ٣٤٧ |
| بنەما هونەرییەکانی ئەفسانەی کوردی بەنموونەی چەند ئەفسانەیەکی ناوچەی پشدەر | پ. هـ. د. ڕۆژگار محمد صابر<br>پ. هـ. د. ناز ئەحمەد سەعید<br>د. ئەڤین ئاسۆس حەمە | ٣٨٧ |
| بنەمایێن ئەفسانەیی د داستانا (شێخێ سەنعانی)یا فەقێ تەیراندا ل دویڤ پیڤەرێن (میرچا ئیلیادە)یی | م. هـ. وحید نعمت رمضان<br>م. هـ. علی عجیل موسی | ٤١٩ |

| | | |
|---|---|---|
| رۆلێ گیانەوەران د پێشڤەبرنا ڕویدانێن ئەفسانەیا فۆلکلۆریا کوردیدا ئەفسانەیا "دەرویش و حاکم" وەک نموونە | م. هـ. هلز رشید حسین | ٤٤٥ |
| کۆتر وەک هێما د ئەفسانەیێن کوردیدا | د. یەهمان محمد عبدالرحمن<br>م. هـ. مردان رفعت ابوزید<br>د. گەهین نزار ابراهیم | ٤٧٣ |
| [illegible] دوالیزما ئەنیما و ئەنیمۆس د ئەفسانەیا شاهمارانێدا | پ. د. محسن عارف صالح رشید<br>م. هـ. دلێر کمال أحمد<br>م. هـ. داستان طه عبدالله حمو | ٤٩٩ |
| ڕەنگدانەوەی ئەفسانەی (شاماران) لە تابلۆکانی (ئاغالە)دا | د. نەزیرە صابر مصطفی | ٥٣٥ |
| ئەفسانا شاهماران دناڤبەرا ڤەگێڕانێن کوردی و ئەرمەنی دیدا (ڤەکۆلینەکا بەراوردکاری) | پ. هـ. د. ڤان نەعمان حاجی | ٥٦٩ |
| ئەفسانەی کوردیی شاماران لە ڕوانگەی ئارکیتایپەکانی کارڵ گۆستاف یۆنگەوە (لێکۆلینەوەیەکی دەروونشیکاری) | د. هەژار فەقێ سلێمان حسێن<br>م. ی. ژینۆ عەبدولڕەحمان محەمەد | ٥٨٧ |
| لایەنێ ئەفسانەیی د حیکایەتا فۆلکلۆریا کوردیدا ل دویڤ تیۆرا دەروونشیکاریا یونگی، جیرۆکا (خەونا خونکاری) وەک نموونە | م. هـ. ئەڤراز سلێمان حاجي<br>پ. د. عماد ویسی خالد | ٦٣٣ |
| دەرکەوتەکانی ئەنیما و ئەنیمۆس لە حەکایەتی کوردیدا | پ. ی. د. هەژار ئەحمەد عەبدولغەفوور<br>م. ی. هەدار سەفەری محەممەد | ٦٤٧ |
| خێر و شەڕ د ئەفسانەیا "ئەو مریێ خزمەتا ساخان کری"دا ل گۆڕەی ئۆلا ئێزدییان و چەمکێن دەروونیێن کارل گۆستاف یۆنگ | م. ژێهات قادر حەسەن | ٦٧٣ |
| سیما و دەرکەوتەکانی ئایین لە نێو ئەفسانەی کوردیدا | پ. د. پەخشان سابیر حەمەد | ٧٠٣ |
| ئەفسانەیا (ساخکرنا مریان) ل پەیی ئەدەبیاتا ئێزدیان | م. کۆڤان ڕێسان حەسەن | ٧٢٩ |
| پەنابردن بۆ چاک و شەخس وەکو پاشماوەی بیری ئەفسانەیی | د. رزگار عبدالله احمد | ٧٥٧ |
| کاریگەریی ئەفسانەی (ڕۆدۆپیس)ی میسری کۆن لەسەر ئەفسانەی (دادە ماسی)ی زاری لوڕیی کوردیدا (توێژینەوەیەکی بەراوردی ئەدەبییە بەپێی قوتابخانەی فەرەنسی) | پ.ی.د. ڕێبین خلیل قادر | ٧٨٣ |

| | | |
|---|---|---|
| رۆڵی ئەفسانە لە پاراستنی مێژوو و کەلەپووری کۆنی کوردی | پ. ی. د. هیوا کەریم حسێن | ٨١٥ |
| ئەفسانە لە نێو جووەکان لە هەرێمی کوردستان (چەند نموونەیەکی هەلبژێردراوی ناوچەی بادینان) | پ. ی. د. زریان جیزنی محمد<br>سازان صباح پیربال | ٨٣٣ |
| ڕەهەندە ئەفسانەییەکانی حیکایەتی زوحاك و کاوەی ئاسنگەر | پ. د. کەیفی ئەحمەد عبدالقادر | ٨٥١ |
| پێشدادییێن زاگروسی و کەیانییێن میدی (هەڤبەندیا ئەفسانەیا گەلێن ئیرانی دگەل دیرۆکا دێرینا کوردستانێ) | فۆڕات تەوفیق ئەبوزەید (کوردزادە) | ٨٨٧ |
| ئافراندنا کنیاتێ دناڤبەرا ئەفسانە و باوەرییێن ئۆلیدا (قەولێ زەبوونێ دل مەکسوور و شێخوبەکر) وەکو نموونە | م. شمال خمو خضر | ٩١٧ |
| ئەفسانەیا ئاڤارەش (تۆفان)ێ د ئەدەبییاتا ئۆلا ئێزدییاندا | م. ساکار کامل | ٩٤٥ |
| ڕەنگدانەوەی خواوەند و بوونەوەرە لێکدراوە ئەفسانەییەکانی میزۆپۆتامیا لە هونەری جیانشینانی زاگرۆسدا | م. هێرۆ کەمال کەریم | ٩٧٣ |
| کاریگەری وڕەنگدانەوەی ئەفسانەی ئۆدیب لەسەر ئەفسانەی (شاعەباس وچارەنوس)ی کوردی شێوەزاری لوڕیدا. | پ. د. سەردار ئەحمەد گەردی | ١٠٠٧ |
| ئەفسانەیا نەژادێ کوردی د پەرتووکێن زانا و نڤیسەر و دیرۆکناساندا، ڤەکۆلینەکا مێژوویی - ڕەخنەیی - شرۆڤەکاری | م. مجاهد عزیز عبدالرزاق | ١٠٣٢ |
| نەخشەکرنا میتافۆرێن چەمکییێن دەمی د ئەفسانەیێن کوردیدا | پ. هـ. د. سەلوا فەریق سالح<br>پ. هـ. د. شورشڤان عادل احمد | ١٠٧٧ |
| شیکردنەوەی شێوازی بەکارهێنانی زمان لە دەقی ئەفسانەی کوردی ئەفسانەی "سەلیمی جەوهەریی" بە نموونە | د. سۆران عبدالرحمن حمد<br>د. شنۆ عەوڵا حەمەدئەمین | ١١٠٩ |
| دوانەی ڕێگر و یاریدەدەر لە گێڕانەوەناسیی گریماس داکورەکەچەڵ لە ئەفسانەی کوردیدا بە نموونە | د. هەرێم عوسمان<br>د. هێمن کەریم<br>م. مەزهەر ئیبراهیمی | ١١٤١ |

| | | |
|---|---|---|
| ئەنجامدانی کێشی فرێ و خاڵبوون ئەستی لەڕووی فۆنۆلۆژی، مۆرفۆلۆژی، سینتاکس و سیمانتیکسدا | د. سەعد قازی | ١١٦٧ |
| ڕەنگ لە گۆڕانەکانی ئەفسانەی (هێلکەی نامۆ)دا لێکۆڵینەوەیەکی زمانەوانییە | د. امیر مسطو محمد<br>م. میدیا مراد محمدامین | ١١٩٣ |
| المقدمة | أ. د. حسين عثمان عبدالرحمن | ١٢٣٥ |
| الروايات الاسطورية للأصل الكوردي دراسة نقدية تحليلية | أ. د. فرست مرعي | ١٢٣٩ |
| المرأة في الاساطيرالكوردستانية القديمة | أ. م. د. نيزيار نعمان نعمان | ١٢٦١ |
| كسر البيضة الكونية 'دراسة مقارنة بين اسطورة الخلق الصينية والايزيدية' | خيري الياس علي ال عيسو (خيري بوزاني) | ١٢٨٨ |
| اسطورة الخلق في الديانة الزردشتية | لقمان محمود قاسم | ١٣١٣ |
| انعكاس الصراعات على الأساطير الكوردستانية القديمة الأساطيرالحورية/ الميتانية انموذجاً نظرة تحليلية | ا.د.عيماد عبدالقادر محمد سعيد | ١٣٤٧ |
| دور الأسطورة في الحفاظ على هوية اللغات الأساطير الكوردية نموذجا | عبدالخالق سلطان محمود | ١٣٦٩ |
| الأسطورة والتاريخ والأنساق الذهنية الأخرى بلاد ما بين النهرين نموذجا | د. عبدالباسط سيدا | ١٣٩١ |
| ریخت شناسی افسانهٔ فولکلور «بی‌بی سه‌شنبه» براساس دیدگاه پراپ و عجین شدن آن با باورهای مذهبی کردهای کلهر کرمانشاه | سمیه محمدی<br>کۆرەک علی احمد<br>پیشرەو عبدالله حمه غریب | ١٤٢٥ |
| بازتاب اسطوره در ادبیات فولکلور کردی | فرزانه هدایتی زاده<br>هانا هدایتی زاده | ١٤٤٩ |
| Prof. Dr. Hussein Othman Abdul Rahman | Introduction | 1477 |
| Doç. Dr. Haşım ÖZDAŞ | Miqayesekirina Mîtosa Afirandinê ya Êzîdîyan bi Qur'ana Pîroz ra | 1479 |
| Elif Gemicioğlu Yaviç<br>Doç. Dr. Mesut Düzce | MOTÎFÊN JINÊ Û YÊN DÎNÎ DI EFSANEYA ŞAHMARANÊ DE | 1497 |

| | | |
|---|---|---|
| 1513 | Jinavêçûna Hin Bîr, Bawerî û Agahîyên Dîrokî yên Kurmancên Xerzan ji ber Windabûna Efsaneyên Wan | Dr. Ayhan YILDIZ |
| 1535 | Heroism in Aeschylus's Prometheus Bound and Ferdowsi's Shahnameh; Kawa the Blacksmith | Baroj Hashim Abdi |
| 1551 | ZEMBİLFROŞ EFSANESİNDEKİ MOTİFLERİN HZ. YÛSUF KISSASIYLA MUKAYESESİ | Doç. Dr. Nurettin ÇİFTÇİ |

# Miqayesekirina Mîtosa Afirandinê ya Êzîdîyan bi Qur'ana Pîroz ra

Doç. Dr. Haşım ÖZDAŞ
İlahiyat Fakültesi- Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi \ Van

**Puxte**

Vegotinên li ser afirandinê di gelek qewlên êzîdîyan da cih digirin. Hin ji wan qewlan rasterast behsa afirandinê dikin. Di hin qewlan da jî hin mesele derbas dibin ku bi destpêka afirandinê ra eleqedar in. Mijara afirandinê di "Mishefa Reş" da jî cih digire. Lêbelê ji ber sedemên curbicur gelek vekolîner li ser wê fikrê ne ku ew ne kitêbeke êzîdîyan a resen e. Ji ber vê yekê me di vê xebata xwe da "qewl"ên wan ên ku bi afirandinê ra eleqedar in û bi bawerîya wan bingeheke wan a îlahî heye wekî esas girtin. Mijara afirandina erd û asîmanan, cin-milyaketan û însanê ewil di gelek ayetên Qur'ana Pîroz da jî bi berfirehî tê vegotin. Em dê di vê xebata xwe da li ser van mijaran rawestin: Afirandina erd û asîmanan, çêbûna milyaket û cinan, xuliqandina însanê ewil û jina wî. Bêyî ku em rexneyan li alîyekî bigirin an jî behsa rastî yan jî şaşîya yekî bikin, em dê van meseleyan di çarçoveya qewlên êzîdîyan da bi vegotinên Qur'ana Pîroz ra miqayese bikin.

**Peyvên Sereke:** *Mîtos, Afirandin, Qewl, Qur'an, Miqayesekirin.*

## Destpêk

"Mîtos" (mythos) bêjeyeke Yewnanî ye ku tê maneya "vegotin" û "çîrok"ê. "Logos" jî bi maneya "gotin"ê ye. Ji van her duyan "mîtolojî" hatîye çêkirin (Can, 2011, r. 17). Peyva "mîtos"ê di xeberdanên roja ne da pirê caran bi vê maneyê tê bikaranîn: "Çîrok, lîhevanîn û vegotinên ku li ser xewn û xeyalan hatine avakirin." Digel vê, tê gotin ku ev peyv ji alîyê etnolog, civaknas û dîroknasên tarîxa dînan ve bi gelemperî bi vê maneyê ye: "Kevneşopîya pîroz, wehîya herî kevn, modela ku wekî nimûne tê nîşandan" (Eliade, 2001, r. 11). Li gor Mircea Eliade (w. 1986) peydakirina pênaseyekê ji bo mîtê ku hemû zanyar qebûl bikin, di heman demê da ji bo kesên jirêzê jî ne xerîb be, gelekî zehmet e. Bi ya wî, mît çîrokeke pîroz vedibêje, bûyereke wisa vedibêje ku di demeke gelekî kevin da qewimîye û qedîyaye. Mît her dem çîroka "afirandin"ekê ye, wê yekê vedibêje ka tiştek çawa hatîye afirandin û çawa derketîye alema heyînê (Eliade, 2001, r. 15-16).

Tê gotin ku êzdîyatî bi koka xwe digihîje hin dînên kevin ên Mezopotamyayê û Hindo-Îranî. Ew li ser bingeheke felsefî û mîtolojîyeke bi reh hatîye avakirin. Dîndarên êzîdîyan metnên xwe yên dînî nifş bi nifş bi devkî ezber kirine û bi sed salan di sînga xwe da ew parastine. Ji ber vê yekê car caran hin guhertinên biçûk di navbera wan da tê dîtin. Hin ji wan metnan bi afirandinê ra eleqedar in. Yek ji wan metnan qewl e. Bi bawerîya wan bingeheke qewlan a semawî heye (Omerxalî & Xankî, 2009, r. 11-13, 19, 96).

Di çavkanîyan da behsa du kitêbên êzîdîyan ên pîroz tê kirin. Kitêba bi navê "Kîtabu'l-Cilwe"yê bi bal Şêx Adî b. Misafir ve, "Mishefa Reş" jî bi bal Şêx Hesen b. Adî ve tê nisbetkirin (Guest, 2007, r. 347). Bi bawerîya Roger Lescot (w. 1975), ev her du kitêb ji alîyê hin xirîstîyanên miqelid ve hatine nivîsandin (Lescot, 2014, r. 11). Jixwe di roja me da hema bibêje hemû zanyar ji ber ziman û naveroka wan li ser wê fikrê ne ku ew ne kitêbên wan ên resen in. Loma ji bo famkirina vî dînî divê meriv li qewl, beyt û çîrokên wan hûr bibe (Omerxalî & Xankî, 2009, r. 20).

Nasır Heval Batu di xebata xwe ya bi navê "Mîtosa Afirandinê di Rîwayetên Kurdên Êzıdî û Yarsan de" ku wekî teza lîsansa bilind hatîye amadekirin, mîtosa afirandinê ya êzîdîyan bi ya yarsanan ra miqayese kirîye. Lêbelê di vê xebatê da -bi gotina wî ji ber ku rasterast bi mijara afirandinê ra girêdayî ye- bi tenê "Qewlê Afirandina Dinyayê" wekî esas hatîye girtin (Batu, 2024, r. 4). Bi bawerîya me ji bo miqayesekirineke birêkûpêk divê qewlên wan ên din ku behsa afirandinê dikin li ber çavan bihatina girtin.

Li alîyê din "Mishefa Reş" di gelek xebatan da wekî çavkanî tê bikaranîn (Silêman, 2001, r. 116). Ji ber ku êzîdî vê wekî kitêba xwe ya resen qebûl nakin (Omerxalî, 2017, r. 41), me ew di xebata xwe da bi kar neanî. Li şûna wê me qewlên ku bi mîrata wan a devkî ve girêdayî ye esas girtin. Lewra di wêjeya dînî ya êzîdîyan da payeya herî bilind a qewlan e ku wekî helbestên pîroz tên qebûlkirin. Bi piranî bawerî ew e ku nivîskarên qewlan kesayetên dîrokî ne. Herweha li gor kevneşopîya wan eslê qewlan îlahî ne. Lewra hostayên êzîdî yên deqên dînî qewlan wekî "gotinên Xwedê" an jî "gotinên mêrên xas" pênase dikin. Li gor vê, Xwedê ev gotin bi rêya wan şandine, da ku evdên wî li gor wan gotinan tev bigerin (Omerxalî, 2017, r. 93).

Em dê di vê xebata xwe da di çarçoveya qewlan da mijara afirandinê, bi vegotinên Qur'ana Pîroz ra miqayese bikin. Bi vê yekê em dê hewl bidin ku xalên hevşib û cudahîyên di navbera her du vegotinan da derxin holê. Ji bo qewlan kitêba Xelîl Cindî Reşo ya bi navê "Perin ji Edebê Dînê Êzdîyan" û kitêba Kreyenbroek & Reşow a bi navê "Tanrı ve Şeyh Adi Kusursuzdur Yezidi Tarihinden Kutsal Şiirler ve Dinsel Anlatılar" esas hatîye girtin. Hin caran kitêba Kreyenbroek a bi navê "Yezidism- Its Background, Observances and Textual Tradition" û kêm caran kitêba T'êmûrê Meso ya bi navê "Newşe Dînê Êzîdiyan" jî hatîye bikaranîn. Ji bo ku xebat zêde dirêj nebe, me hem cih neda îfadeyên qewlan bixwe hem jî îfadeyên erebî ên ayetan. Li şûna vê, di nav metnê da yan jî di nav kevanekê da nav, hejmara sûre û ayetan hatîye destnîşankirin. Navê qewlan û hejmara sebeqeyan di nav kevanekê da weha hatîye kurtkirin: Qewlê Zebûnî Meksûr (ZB), Qewlê Afirandina Dinyayê (AD), Qewlê Hezar û Yek Nav (HYN), Qewlê Îmanê (QÎ), Qewlê Qere Ferqan (QF), Qewlê Îlmê Nadir/Dua Baweriyê (ÎN/DB), Qewlê Seremergê (SM), Qewlê Erd û 'Ezman (EE), Qewlê Şêxûbekir (QŞ), Qewlê Herê Berê Bû (HBB), Qewlê Meha (QM), Qewlê Nasirdîn (QN), Qewlê Ereb Begîya (QEB), Qewlê Sura (QS), Qewlê Pîrê Sîba (PS), Qewlê Kasa (QK), Qewlê Ez Rojekê Sefer Bûm (ERSB), Qewlê Padşay/Qewlê Xwedanan (QP/QX), Qewlê Bê û Elîf (BE), Qewlê Qendîla (QQ), Qewlê Tawisê Melek (TM), Dua Sebrê (DS), Dua Tifaqê (DT), Dua Mirazê (DM), Dua Rojane (DR), Dua Hêvarê (DH). Hin qewl du varyantên wan hene. Ev yek piştî navê qewlan ê kurtkirî weha hatîye destnîşankirin (I.) û (II.)

## 1. AFIRANDIN DI ÇARÇOVEYA QEWLÊN ÊZÎDÎYAN DA

Mijara afirandinê di gelek qewlan da cih digire. Hin qewl rasterast li ser wê yekê dikesinin bê ka alem ji çi çê bûye û çawa hatîye çêkirin. Hin meseleyên ku bi destpêka afirandinê ra eleqedar in di hin qewlên din da derbas dibe. Hin qewl jî hene ku felsefeya êzîdîyan a li ser afirandinê temam dikin.

### 1.1. Ji Ezelê Heta Afirandina Heft Milyaketan

Dema ezoterîk a ku bi peyva "enzel"ê tê îfadekirin di mîtolojîya kozmogonîk a êzîdîyan da roleke giring dilîze (Omerxalî, 2017, r. 108). Ev peyva ku bi maneya "ezel"ê ye gelek caran di heqê "Xwedê" da tê bikaranîn. Ev peyv ji bo nîşandana dema berî afirandinê û îfadekirina alema xeynî madeyî wekî "sur", "kase", "kelime" û hwd. jî tê gotin (Omerxalî & Xankî, 2009, r. 50).

Di sebeqeyekê da (ZM.I: 4.) ku bi destpêka afirandinê ra eleqedar e wekî "behr", "dur" û "mîr" sê peyvên sereke derdikevin pêşberî me (Reşo, 2004, r. 1/51; Kreyenbroek, 1995, r. 170). Dîyar e ku peyva "mîr" bi maneya Xwedê ye. Meriv dikare vê yekê bipirse gelo Xwedê; behr û dur çê kirin û paşê xwe xistîye nav durê, yan ew û dur ji behrê çê bûne û bi hev ra mane (Reşo, 2004, r. 1/151). Lewra di sebeqeyekê da (ZM: 6.) weha tê gotin: "Pedşê min ji durrê bû" (Kreyenbroek, 1995, r. 170). Li gor vê, divê ku Xwedê û dur heman tişt bin an jî Xwedê ji durê be. Lêbelê em dibînin ku di hin sebeqeyên din da (QŞ.I: 2-5.) ewil ev yek tê pirsîn "dur ji Pedşê ye, yan Pedşa ji durê ye?" û paşê tê gotin ku "Pedşê min dur ji xwe çê kir" (Reşo, 2004, r. 1/185-186, 191). Herweha ji hin sebeqeyên din (ZM.I: 6; ZM.II: 6.) tê famkirin ku Xwedê di serî da bi durê ra bûye yan jî li durê bûye û bi hîsa ku ji Xwedê cihê dibe şaxa muhebetê ava bûye (Reşo, 2004, r. 1/152, 161-162; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 100).

Berî afirandina erd û asîmanan û çêbûna însan û heywanan her der reş û tarî bûye. Digel Xwedê bi tenê dura di nav behran da hebûye. Bi gotineke din (AD: 1-5.) piştî ku Xwedê durê ji xwe cihê dike yan jî ji xwe çê dike û ji nav durê derdikeve ruh dide durê (Kreyenbroek, 1995, r. 182; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 116). Ev yek di sebeqeyeke din da (ZM.I: 11.) jî cih digire (Reşo, 2004, r. 1/162; Kreyenbroek, 1995, r. 172).

Behr ji pêlên ku bi durê dikevin çê dibe (QF: 11.) (Reşo, 2004, r. 1/199; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 171). Ev rewşa ji aramîyê bi bal halê hereketkirinê ve wekî sembola ji yekîtîyê bi bal pirbûnê ve tê şirovekirin (Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 57). Dîsa li gor hin sebeqeyan (ZM.I: 9-10.), ji ber ku dur nikare heybeta Xwedê hilgire diteqe û bi rengê sor, spî û zer dixemile (Reşo, 2004, r. 1/152-153; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 100; Kreyenbroek, 1995, r. 170-172).

Di hin sebeqeyan da (ÎN/DB: 1-3.) ev yek derbas dibe ku hîn berî erd, asîman, çîya û însan bên afirandin, Xwedê li nav durê bi tena serê xwe bû. Ewil bawerî çê kirîye û bi not û neh rengên cuda ew şandîye, paşê bi wê xwe ji durê cihê kirîye (Reşo, 2004, r. 1/238; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 188). Em ji hin sebeqeyên din (ZM.I: 8.) têdigihîjin ku Xwedê di serê ewil da "muhebet", piştî wê jî "kase" xuliqandîye. Ew bûne hêmanên bingehîn ji bo çêbûna gelek tiştên din (Reşo, 2004, r. 1/152; Kreyenbroek, 1995, r. 170).

Li gor hin sebeqeyan (ZM.II: 12.) piştî ku Xwedê durê ji xwe cihê dike yan jî çê dike, bi erêkirina yarekî, xerqeya nûranî çê dike (Reşo, 2004, r. 1/162-163; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 100-101). Li gor vê, ew berî gelek tiştên din hatîye afirandin. Bi gotineke din xerqeya ku wekî "sur"ekê tê binavkirin (Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 59), ji muhebeta bi Xwedê ra çê bûye, hatîye çêkirin (QF: 6-7.). Tiştê ku Xwedê di serî da diperest xerqe bû. Piştî "heft" an jî "heft sed" salan ji mubeheta ku bi Xwedê ra çê dibe xerqe dibin çar û bi qasî not hezar salî li qendîlê tên parastin û paşê wekî çar yaran zahir dibin (QF: 8-9.). Xerqeya safî bi rêya Siltan Êzî şikil û şemalê digire. Piştî ku nazilî ser rûyê erdê dibe Melik Fexredîn wî teslîmî mêrên xas ên Şêx Adî dike (QF: 19-21. 24.) (Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 170-174; Reşo, 2004, r. 1/197-201). Bi bawerîya wan, ew berî hatina Şêx Adî jî hebûye (Omerxalî & Xankî, (2009), r. 37) û di navbera xerqe û bawerîyê da têkilîyek xurt heye. Lewra li gor hin sebeqeyan (ÎN/DB: 7.) afirandina xerqeyê bi rêya bawerîyê çê bûye (Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 189).

Lalişa nûranî ji derveyî erd û asîmanên madî li jorê hatîye afirandin (Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 59). Wê hingê hîn erd û asîman û 'erş nehatibûne avakirin (ZB.I: 18.) (Reşo, 2004, r. 1/154; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 101). Li gor hin sebeqeyan (ZM: 16.) heqîqet û şerî'et di destpêka afirandinê da ji hev cihê bûne (Reşo, 2004, r. 1/163; Kreyenbroek, 1995, r. 172). Bi bawerîya wan heqîqet dînê rast, şerî'et dînê qelp û sexte temsîl dike (Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 59).

**1.2. Afirandina Milyaketan**

Li gor hin sebeqeyan (ZM.II: 61.) Xwedê nûr e û pê xemilîye (Reşo, 2004, r. 1/170). Milyaket ji nûra Xwedê hatine afirandin (ZM.I: 27; QN: 6; QP/QX: 3.) (Reşo, 2004, r. 1/156). Jixwe di sebeqeyekê da (DM: 2.) tê gotin ku Xwedê, 'Ezrayîl ji nûra xwe afirandîye (Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 483). Bi bawerîya wan çawa ku çirayek bi agirê çirayeke din vêdikeve, milyaket jî wisa ji nûra Xwedê çê bûne (Reşo, 2004, r. 1/156).

Lêbelê li gor sebeqeya (HBB: 9.) qewlekî din Melik Şêx Sinê ku wekî dura ewil tê qebûlkirin ji muhebeta Xwedê hatîye çêkirin (Reşo, 2004, r. 1/260). Herweha sebeqeyeke din (HBB: 14) radigihîne ku hem Melik Şêx Sin hem jî Melik Fexredîn ji kefa ku bi dura spî dikeve, çê bûne (Reşo, 2004, r. 1/261). Ji xeynî vê, li gor bawerîya êzîdîyan (ZM.II: 61) sura Şêx Adî her ewil e, lê bi kirasê beşerî ew ê herî dawî ye (Reşo, 2004, r. 1/170).

Her rojekê milyaketek hatîye afirandin, lê bi zelalî ne dîyar e ka kîjan milyaket kîjan rojê hatîye afirandin (Silêman, 2001, r. 116). Çawa ku Xwedê tu carî namire, herwisa milyaketên wî jî nemir in (PS: 5.) (T'êmûrê Meso, 2018, r. 703). Ew tiştekî naxwin, bi rehmeta Xwedê têr dibin. Xwarina wan hemd û şikrê Xwedê ye. Milyaket bi nezera wan a li hev didebirin (Silêman, 2001, r. 117).

Di sebeqeyekê da (EE: 25.) cih digire ku asîman cihê nûrê ye û qendîl li wir e. Herweha ew der cihê heft milyaketên mezin e (Reşo, 2004, r. 1/210; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 670). Di serê ewil da ji kaseya durê "mêrên xas" çê bûne (AD: 7.) (Kreyenbroek, 1995, r. 182; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 116) ku li gor qewlekî din (ZB. II: 37.) ew her "heft sur" in (Reşo, 2004, r. 1/166; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 103). Jixwe bi bawerîya êzîdîyan sura sunetê ya tê gotin (ZM.I: 14-15.) ku mabû mu'eleq

li hewa (Reşo, 2004, r. 1/153; Kreyenbroek, 1995, r. 172) sura Melik Şêx Sin e. Li gor vê ev sura ku mehbûbê Xwedê ye berî milyaketan hatîye afirandin (Reşo, 2004, r. 1/153).

Tê gotin ku li ser navê van her heft milyaketan tifaqek tune ye (Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 58). Navê wan di sebeqeyekê da (EE: 25.) weha derbas dibe: 'Ezrayîl, Cibrayîl, Mîkayîl, Derdayîl, 'Ezazîl, Îsrafîl û Şimxayîl (Reşo, 2004, r. 1/210; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 670). Li cihekî (DS: 18.) din ev nav cih digirin: 'Ezrayîl, Cibrayîl, Mîkayîl, Derdayîl, 'Ezazîl, 'Ezrafîl û Şifqayîl (Reşo, 2004, r. 2/1024). Anku li şûna "Îsrafîl" û "Şimxayîl"; "'Ezrafîl" û Şifqayîl hatîye gotin. Her du navên dawîn di sebeqeyeke dîn da (DH: 13.) wekî "'Ezafîl" û Şifqayîl" cih digirin (Reşo, 2004, r. 2/987). Ji xeynî çar navên dî serî da di sebeqeyekê (DR.I: 10.) da ev her sê nav derbas dibin: "Îsrafîl", "Şifqayîl" û "Nûrayîl" (T'êmûrê Meso, 2018, r. 615). Di sebeqeyeke din da (DR.II: 11.) cudahî bi tenê di du navên dawîn da hene: "Îsrafîl", "Şifqayîl" (T'êmûrê Meso, 2018, r. 616).

Tê gotin ku bi piranî fonksîyoneke kaseyê ya wisa heye ku derbasbûna ji alema batinî bi bal alema zahirî ve hêsan dike (Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 60). Li gor sebeqeyên (HYN: 9-11.) qewlekî her heft milyaket bi saya vexwarina ji wê kaseyê li ser rûyê erdê bûne padişah (Reşo, 2004, r. 1/214-215; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 134). Tê gotin ku sur û nûra van milyaketan ketine ber xasên êzîdîyan. Piştî ku bi kirasê beşerî li ser rûyê erdê zahir bûne, bi van navan bi nav bûne: Ezrayîl = Melek Nasirdîn, Cibrayîl = Melek Sicadîn, Mîkayîl = Melek Fexredîn, Derdayîl = Melek Şêxûbekir, Şemqayîl = Melek Şemsedîn, Ezazîl (Tawisî Melek) = Şêx Adî, Îsrafîl = Melek Şêxsin (Silêman, 2001, r. 117, 120).

Li alîyê din em di hin sebeqeyan da (AD: 19) dibînin ku behsa wan wekî şeş milyaketan tê kirin (Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 118; Kreyenbroek, 1995, r. 186). Sedema vê yekê weha tê şirovekirin: Bi bawerîya wan Xwedê jî di nav van her heftan da ye (Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 58). Di hin sebeqeyên din da jî (QŞ.I: 17-23) behsa wê yekê tê kirin ku di serê ewil her heft milyaket çawa ji nûrê zêde bûne (Reşo, 2004, r. 1/188-189; Kreyenbroek, 1995, r. 210-212). Meriv wisa hizir dike ku li vir Xwedê jî di nav van heftan da ye, lêbelê gava meriv bi hûrgilî li sebeqeyan binêrê dê bibîne ku Xwedê ne di nav vê hejmarê da ye.

Çar ji van heftan pirê caran wekî komeke din a bi navê "çar yaran" an "melek" tên pênasekirin ku di hemû kar û baran da yekîtîya wan heye (Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 58). Piştî ku pêl bi behrê dikevin û di ser ra not hezar sal derbas dibe "çar yar" tên xuliqandin û kar û barê dinyayê bi bal wan ve tê spartin (QF: 9-11.) (Reşo, 2004, r. 1/198-199; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 170-171). Anku ev her çar yarên xwedî qîmet li gor rê û rêbazekê karê zêdebûna tiştan a ji durê bi rêya wan çê dibe (QŞ.II: 28-29.) (Reşo, 2004, r. 1/195; Kreyenbroek, 1995, r. 212). Herî dawî di hin sebeqeyan da (TM: 3.) navê cinan jî derbas dibe, lêbelê tu agahî di heqê wan da nayê dayîn (Reşo, 2004, r. 2/990; Kreyenbroek, 1995, r. 244).

**1.3. Afirandina Erd û Asîmanan**

Li gor agahîyên ku di qewlekî da (ZM.I: 21.) derbas dibin behr, ji ava ku ji durê pengîyaye, çê bûye (Reşo, 2004, r. 1/155; Kreyenbroek, 1995, r. 174). Anku ew jî alîyê Xwedê ve hatîye afirandin. Dîsa em ji hin sebeqeyan (ZM.I: 20-21) têdigihîjin ku Xwedê ji durê ra gotinekê dibêje û bi vê gotinê av jê tê û dibe behr (Reşo, 2004, r. 1/154-155;

Kreyenbroek, 1995, r. 172-174). Ev yek, di qewlekî din da (HBB: 20.) jî derbas dibe (Reşo, 2004, r. 1/261-262).

Xwedê û her çar yar li merkebekê siwar dibin û li çar kenarên wê behrê digerin (ZM.I: 21; ZB.II: 26) (Reşo, 2004, r. 1/155, 164-165; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 102; Kreyenbroek, 1995, r. 174). Li gor hin sebeqeyan (QŞ.I: 27-28.) her çar yarên ku ji durê hatine afirandin av, ba, agir û ax e (Reşo, 2004, r. 1/189-190; Kreyenbroek, 1995, r. 212). Lêbelê navê van çar yaran di qewlekî din da (QF: 10.) wekî Şîxadî, Şêx Sin, Nasirdîn û Sicadîn cih digire (Reşo, 2004, r. 1/199; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 170-171). Tê gotin ku di navbera van kesan û çar elementan da têkilî heye (Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 58). Li gor vê, li beramber her hêmanekî ji van unsurên madî, çar sur û hêzên ku li asîmanan hatine çêkirin ev in: Şêx Adî = av, Şêx Sin = ba, Nasirdîn = agir, Sicadîn = ax. Kaînat ji van çê dibe (Reşo, 2004, r. 1/155, 190).

Li gor agahîyên ku di qewlekî da (ZM.I: 19.) cih digirin, Xwedê û her heft surên xewle anku heft milyaket di nav xwe da şêwrê dikin. Li pey vê, qonaxa avakirina alemê ya bi milyaketan ra dest pê dike (Reşo, 2004, r. 1/154; Kreyenbroek, 1995, r. 174).

Xwedê bi haveynê ku diavêje navê, behr dimeye. Duxanek jê derdikeve û jê heft tebeq erd, heft jî asîman bi tevahî çardeh tebeqe tên afirandin (AD: 10.) (Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 117; Kreyenbroek, 1995, r. 184). Di hin sebeqeyên din da (ZB.II: 27-28.) bi tenê behsa wê yekê tê kirin ku bi duxana ku ji wê behrê derdikeve heft tebeq asîman tên afirandin. Asîman bi jor ve dibe, erd li jêrê dimîne (Reşo, 2004, r. 1/165; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 102).

Li alîyê din herçiqas di hin sebeqeyan (QF: 12) da wekî "Her çar 'ezman pê nijinî" derbas bibe jî (Reşo, 2004, r. 1/199; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 172) ji hin sebeqeyên din (AD: 10; EE: 13.) tê famkirin ku erd û asîman bi hev ra çardeh tebeqe ne (Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 117, 668; Kreyenbroek, 1995, r. 184; Reşo, 2004, r. 1/208-209). Herweha ev yek jî derdikeve holê ku erd piştî asîmanan hatîye afirandin (ZM.I: 26.) (Reşo, 2004, r. 1/156; Kreyenbroek, 1995, r. 174).

Ew li ser pişta ga û masî ne (ÎN/DB: 11-12.) (Reşo, 2004, r. 1/241). Ga û masî di nav wan heyînin ewil da tên hesibandin ku di serê ewil hatine afirandin. Erd û asîman li ser pişta wan e (ÎN/DB: 10-11.) (Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 189; Reşo, 2004, r. 1/241). Bi bawerîya wan dinya li ser pişta gayekî ye û ew jî li ser pişta masîyekî ye (Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 140). Tê gotin (HYN: 4-7. 11-12.) ku masî heft caran ji ga mezintir e. Heftê û du perên masî hene, yek jê kember e û ga li ser e. Heft milyaket li ber serê wî gayî rawestîyane. Her heft ji kaseyê vedixwin. Ga û masî ji kaseyê vedixwin û bi saya vê yekê qebûl dikin ku deşt, banî, ber û behrê li ser pişta xwe hilgirin (Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 133-134; Reşo, 2004, r. 1/214-215). Herweha tê gotin (DS: 10.) ku ga û masî bi saya sebrê, Xwedayê xwe nas kirine (Reşo, 2004, r. 2/1023).

Afirandina erd û asîmanan di hin sebeqeyan (DT: 3.) da wekî karê milyaketan tê destnîşankirin (Reşo, 2004, r. 2/1025). Li gor êzîdîyan bawerî rukin û esasê avabûna erd û asîmanan e. Xwedê bawerî û rastîyê datîne nav milyaketan û ew bi wan ava dikin çardeh tebeqên erd û asîmanan (ÎN/DB: 12-13) (Reşo, 2004, r. 1/241; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 189). Lêbelê ev yek jî tê gotin (EE: 4-6.) erd û asîman ji heman cewherî

ne, bi şefqet û ji nezera Xwedê ya rehmanî hatine xuliqandin (Reşo, 2004, r. 1/207-208; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 667). Jixwe di qewlekî da (QM: 3-4. 8.) behsa wê yekê tê kirin ku çêbûna erd û asîmanan bi teqdîra Xwedê ye. Qedera dinyayê di destê wî da ye. Li ser rûyê erdê deşt çê kirine û li ser çîya bi cih kirine. Herweha tê gotin ku di çêbûnê da roleke bayê ya giring heye (Reşo, 2004, r. 1/263-264). Lêbelê di hin sebeqeyên din da (QP/QX: 5-6.) tê gotin ku piştî avakirina kaînatê ji alîyê Xwedê ve Tawisê Melek dike serwerê her heft surên nemir û karê birêvebirina wê dispêre wan (T'êmûrê Meso, 2018, r. 15). Ji bo vê rewşê di teolojîyê da "deus otiosus" tê gotin (Eliade, 2003, r. 79).

Li alîyê din wekî ku di varyanta qewlekî da (ZM: 23.) cih digire "piştî ku her heft asîman ji wê duxanê çê dibin, Xwedê çar caran li asîmanan digere (ZM: 25.) (Kreyenbroek, 1995, r. 174). Di qewlekî din da (AD: 13-15.) ev yek tê gotin: Paşê Xwedê keştîyekê çê dike û ji însan û heywanan cotekî lê siwar dike. Bi rêbevirîya Xwedê ev keştî li çar kenarên wê behrê digere. Gava keştî qul dibe û av dikeve navê, mar xwe berdide wê qulê û bi vî awayî însan û heywanên di keştîyê da rizgar dibin (Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 118; Kreyenbroek, 1995, r. 184). Meriv di serê ewil da wisa hizir dike ku ev yek bi destpêka afirandinê ra eleqedar e, lêbelê tu têkilîya vê bi çêbûna dinyayê ra tune ye. Bereksî vê dîyar e ku ev mesele bi tûfana Hz. Nûh ra têkildar e.

Di serî da erd û asîman li cihê xwe nedisekinîn. Xwedê li jorê Lalişekê ava dike, muhbet û nûra xwe dixe navê, da ku erd û asîman li cihê xwe bisekinin (ZM.I: 17.) (Reşo, 2004, r. 1/154; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. s. 101).

Qendîl di edebîyata dînî ya êzîdîyan da semboleke pîroz e. Berî ku her "çar xerqe" li ser rûyê erdê zahir bibin not hezar salî li wê derê hatine veşartin (QF: 9.) (Reşo, 2004, r. 1/198-199). Herweha qendîla ku cihê wê yê eslî li asîmanan e têkilîya wê bi erdê ra heye. Lewra bi bawerîya wan ew daketîye ser rûyê erdê (QQ: 6-7.) (Reşo, 2004, r. 1/243-244). Gava kaînat ava dibe qendîla ku Xwedê muhbeta xwe xistîye navê ji jor ve dadikeve xwarê (ZM.I: 20.) (Reşo, 2004, r. 1/154; Kreyenbroek, 1995, r. 174). Muhebeta ku ji Xwedê hasil bûye, dike ku ava li ser rûyê erdê bimeye. Piştî ku muhebet û Lalişa li jor tên xwarê êdî rûyê erdê bi rengan dixemile û nebatat hêşîn dibin (ZB.II: 31-34) (Reşo, 2004, r. 1/165-166; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 103).

Bi gotineke din (AD: 22. 30.) heta ku Lalişa li jor nehat xwarê li ser rûyê erdê tu tişt hêşîn nedibû. Bi daketina wê, erd dimeye. Paşê hêşîn dibe û li ser wê nebatat derdikevin (Kreyenbroek, 1995, r. 186, 188). Bi bawerîya êzîdîyan ev jî bi saya ava Kanîya Spî çê bûye (Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 59). Jixwe li gor sebeqeyekê (QÎ: 3.) berî afirandina erd û asîmanan û hemû tiştên li ser rûyê erdê Siltan Êzî, Kanîya Spî kirîye qibleya mêran (Reşo, 2004, r. 1/171; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 149). Sebeqeyeke din (QF: 16.) jî dîyar dike ku haveynê wê ji "her û her"ê ye (Reşo, 2004, r. 1/200; Kreyenbroek-Reşo, s. 172).

Lêbelê bereksî sebeqeya (ZB.II: 32.) ku dibêje "be'dî çil salî" (Reşo, 2004, r. 1/165; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 120), di qewlekî da (AD: 29-30.) ev yek cih digire ku berî Adem bi heft sed salî rûyê erdê neditebî û tu tişt li ser hêşîn nedibû (Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 102-103).

Xwedê erd û asîmanan ji hev cihê dike, roj û heyvê diafirîne. Piştî vê, şev û roj çê dike. Melik Fexredîn wekî heyvê, Melik Şemsedîn jî wekî rojê tê teswîrkirin (QF: 27-29.) (Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 174; Reşo, 2004, r. 1/202). Meseleya çêbûna roj û heyvê, şev û rojê di hin sebeqeyên din da (QM: 5-6.) jî cih digire (Reşo, 2004, r. 1/264). Li gor hin sebeqeyan erda bê sur, serê ewil li cihê xwe neditebitî û tu tiştek li ser hêşîn nedibû. Ji bo ku erd bitebite û jîyan li ser çê bibe divê ku ew ji asîmanan daketa ser rûyê erdê. Bi bawerîya êzîdîyan ev sur, sura Melik Şêx Sin e (Reşo, 2004, r. 1/165). Ev yek çil salan dewam dike. Piştî ku aramî û xêr li ser her tiştî dibe hakim rûyê erdê bi nebatan dixemile (ZM.I: 28-31.) (Reşo, 2004, r. 1/156; Kreyenbroek, 1995, r. 174). Li gor vê, giha, dar û ber, berî candaran û Adem aleyhiselam hatine afirandin.

**1.4. Afirandina Adem**

Piştî afirandina erd û asîmanan qalibê Adem aleyhiselam ji van çar elementên bi navê ax, av, agir û bayê tê çêkirin (ZB.I: 31-32; ZB.II: 35.) (Reşo, 2004, r. 1/157, 166; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 103; Kreyenbroek, 1995, r. 174). Li hin cihan (AD: 23-24.) wekî çar elementan behsa av, nûr, ax û agir tê kirin (Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 119; Kreyenbroek, 1995, r. 186) Anku ji dêvla "ba"yê "nûr" tê gotin. Bi axa ku dixin nav ava Kanîya Spî qalibê Adem pêxember (DS: 19.) tê çêkirin (Reşo, 2004, r. 2/1024).

Tê gotin (EE: 30.) ku Adem li ser rûyê erdê ji sura Melik Şêx Sin hatîye çêkirin (Reşo, 2004, r. 1/211; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 671). Herweha hin sebeqe (ERSB: 8.) di meseleya çêbûna Adem da û hin mijarên din da behsa payeya Melik Fexredîn dikin (Reşo, 2004, r. 1/529).

Li gor agahîyên ku di gelek qewlan da derbas dibin (ÎN/DB: 15; QÎ: 4-5; SM: 3-5. 37. 39-40.), însan ji ruh û bedenê pêk tê. Ruh berî bedenê hatine afirandin û di qendîlan da hatine parastin. Piştî not hezar salî li ser rûyê erdê zahir bûne. Bi ruhê ku ji qendîlê nazil dibe, beden hereket dike. Piştî ku ji bedenê vediqete ruh namire, vedigere cihê xwe yê ewil anku qendîlê (Reşo, 2004, r. 1/139-140, 144-145, 172, 180, 242; Kreyenbroek, 1995, r. 194, 310, 316).

Piştî ku bedena Adem temam dibe her heft milyaket hewl didin ku ruh îqna bikin da ku bikeve bedena wî. Lêbelê bi ser nakevin û loma ruh heftsed salan nakevê (ZM.I: 33-34.) (Reşo, 2004, r. 1/157-158; Kreyenbroek, 1995, r. 176; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. s. 103). Di hin sebeqeyan da (DS: 20.) ev yek wekî "heşt sed" salan derbas dibe (Reşo, 2004, r. 2/1024). Ji ber vê, beden di cihê xwe da bê hereket dimîne. Paşê Xwedê bangî ruh dike ku tu çima nakevî bedenê, ew jî dibêje wekî adetê aşiqan ji bo ku ez bikevim bedenê divê ji jor ve şibab û qudûm bê xwarê. Piştî ku ji jor ve tên xwarê û nûra muhebetê dikeve serê wî, ruh dikeve bedena Adem. Gava ruh dikeve bedenê tesîrê li Adem dike û pê şîyar dibe. Paşê ji kaseyê vedixwe û jîyana wî dest pê dike. Piştî vê, milyaket Adem hildigirin û dibin cenetê (ZM.I: 35-39.) (Reşo, 2004, r. 1/157-158; Kreyenbroek, 1995, r. 176; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. s. 103-104). Li gor qewlekî din kerameta wê kaseyê digihîje Adem û bi saya wê diçe cenetê (ZB.II: 47). Lêbelê ji ber ku bêsebrî nîşan daye ji cenetê hatîye derxistin (DS: 21.) (Reşo, 2004, r. 2/1024).

Ji vê sebeqeyê (HYN: 1.) dîyar dibe ku Adem bi Hewa ra zewicîye "Siltan Êzi Hawa kire bûk, Adem zava." (Reşo, 2004, r. 1/213). Li hin cihên (EB: 10; QÎ: 4; QS: 7-8.)

din jî behsa Adem û Hewa bi hev ra tê kirin (Reşo, 2004, r. 1/248, 386; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 150). Ji Adem heftê û du milet çê bûne. Herweha behsa hijdeh hezar xulqîyatan jî tê kirin (ZM.I: 40; QEB: 10.) (Reşo, 2004, r. 1/158, 386; Kreyenbroek, 176). Di hin qewlan da wekî "Û heştî hezar xulqiyate" (QF: 33.) cih digire (Reşo, 2004, r. 1/203; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 175). Dîyar e ku ev mexlûq ne ji Adem çê bûne (Omerxalî, 2017, r. 111).

Li alîyê din digel ku di qewlan da rasterast (EB: 11-12.) derbas nabe (Reşo, 2004, r. 1/386), lê bi bawerîya êzîdîyan heftê û du miletên li ser rûyê erdê ji zuryeta Adem û Hewa ne. Lê ew xwe, ji nesla Şehîd b. Cer û Horiya hesab dikin. Ew ji sura Tawisê Melek in (Reşo, 2004, r. 1/386). Dibêjin ku em ji haveynekî sunetî anku nûranî ne, em paqij in û têkilî tu miletan nebûne. Dê û bavê me cenetî ne. Li gor vê bawerîyê, wekî haveynekî nûranî milyaketekî berdidin cêr û jê bi navê Şehîd b. Cer kurek çê dibe (Reşo, 2004, r. 1/14-15, 218). Ev nav di hin qewlan da (ZM.II: 48-49.) wekî Şehîd Pêxember cih digire (Reşo, 2004, r. 1/168). Ev nav wekî "Şît" jî tê gotin (Kaplan, 2013, r. 82). Li gor hin sebeqeyan (ZB.II: 48-49) ev bi kerameta wê kaseyê çê bûye (Reşo, 2004, r. 1/167-168; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 104-105). Paşê ji bo ku pê ra bizewice Horiya b. Hena jê ra ji cenetê tînin (QK: 13-14.) (Reşo, 2004, r. 2/945). Ji vê zewacê cêwîyekî wan çê dibe. Lêbelê pişta wan bi hev ve ye. Xwedê bi şûr pişta wan ji hev dike û lepek goşt ji nav wan dikeve. Ji her du cêwîyan yek dibe şêx ê din dibe pîr, lepa goşt ji dibe murîd. Piştî ku ev her sê bira mezin dibin bi navê Taqiya, Qisiya û Bedriya sê horî ji cenetê ji bo zarokên Şehîd û Horiya hatin (Reşo, 2004, r. 1/14-15, 218; Kaplan, 2013, r. 82-83). Lêbelê hin sebeqe (PS: 1.) radigihînin ku êzîdî bixwe jî wekî bavê me Adem ji ax, av, agir û bayê çê bûne (T'êmûrê Meso, 2018, r. 703), herweha miletên din ji axê hatine afirandin (QN.II: 28.) (Reşo, 2004, r. 1/183).

Li gor hin sebeqeyan (ZM.I: 33.) çêbûna Adem, du rojan dewam kirîye. Roja înê hatîye destpêkirin û roja şemîyê çêbûna bedena wî temam bûye (Reşo, 2004, r. 1/157). Lêbelê di varyanteke (ZM: 31.) din a vê sebeqeyê da weha tê gotin: "Şembû dana esase, îniyê kir xilase" (Kreyenbroek, 1995, r. 176; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 103). Ev tê wê maneyê ku afirandina bedenê heft rojan dewam kirîye. Dîyar e ku ev sebeqe (ZM: 31.) bi yên din ra li hev nake. Lêbelê gava ev sebeqe (ZM.II: 38.) bi yên berî xwe ra bên xwendin, dîyar dibe ku ev mawe, ne bi çêbûna qalibê Adem ra, bi çêbûna alemê ra eleqedar e: "Şembûyê danî esase, li înîyê kirin xilase" (Reşo, 2004, r. 1/166).

## 2. AFIRANDIN DI ÇARÇOVEYA AYETAN DA

Afirandina erd û asîmanan, cin-milyaketan û însanê ewil di gelek ayetên Qur'anê da bi berfirehî tê vegotin.

### 2.1. Afirandina Erd û Asîmanan

Bi vegotina ayeta Mu'min 40/57 û Nazi'at 79/27-28an afirandina erd û asîmanan, karekî ji afirandina merivan mezintir e. Di ayeta Hûd 11/7an da, ku bi destpêka afirandirê ra eleqedar e behsa avê û 'erş tê kirin. Di ayeta Enbîya 21/30î tê destnîşankirin ku Xwedê hemû tiştên candar ji avê afirandine. Ev yek di ayeteke din da jî cih digire (Nûr 24/45).

Li alîyê din 'erş, di ayeta Yûsuf 12/100 û Neml 27/23an da bi maneya "paldanka seltenetê" hatîye bikaranîn. Îstiwaya li ser 'erş jî bi maneya "birêvebirinê" ye. Lewma jî

gotina "Xwedê li 'erş îstiwa kir" ku di ayetên E'raf 7/54; Yûnus 10/3; Taha 20/5; Furqan 25/59; Secde 32/4 û Hedîd 57/4an da cih digire wê yekê îfade dike ku birêveberîya alemê di destê wî da ye (Qurtubî, 2006, r. 9/239-240). Peyva "'erş"ê di ayetên Mu'min 40/7 û Haqqe 69/17an da bi maneya navenda rêveberîyê hatîye bikaranîn. Ji mufesirên serdema ewil Muqatil b. Suleyman (w. 150/767) dibêje ku di risteya ayeta Yûnus 10/3yan da teqdîm û texîr heye. Li gor vê, Xwedê di serî da li ser 'erş îstiwa kir, paşê erd û asîman afirandin (Muqatil, 2002, r. 2/225-226).

Afirandina erd û asîmanan di gelek ayetan da cih digire. Li ser meseyelê di ayeta Enbîya 21/30î da tê gotin ku di serê ewil da erd û asîman retiq bûn, paşê ji hev hatin fetiqkirin. Ev ayet ji alîyê mufesiran ve bi çend awayên cuda hatîye şirovekirin:

1. Her yek ji erd û asîmanan tebeqeyeke bi hev ve bûn. Xwedê erd ji hev veqetand û jê şeş erdên din çê kir, asîman jî wisa. Bi vî awayî heft tebeqeyên erdê yên li bin hev û heft tebeqeyên asîmanan ên li ser hev afirandin (Teberî, 2001, r. 16/256-257).

2. Erd û asîman bi hev ve bûn, Xwedê bi rêya bayê ew ji hev veqetandin (Teberî, 2001, r. 16/256; Maturîdî, 2005, r. 9/276).

3. Li gor hinekên din ev yek bi rêya buxara ku ji avê derketîye pêk hatîye (Muqatil, 2002, r. 3/76).

Em ji ayetên Maîde 4/17-18 û Hicr 15/85an serwext dibin ku alem bi bal sê beşan ve tê teqsîmkirin ku ew jî erd asîman û yên di navbera wan da ne. Di ayetên Yûnus 10/3; Hûd 11/7; Fussilet 41/9-12 û Hedîd 57/4an da tê ragihandin ku erd û asîman; di ayetên Furqan 25/59; Secde 32/4 û Qaf 50/38an da jî erd û asîman û hemû tiştên di navbera wan da di "şeş rojan" (ستة ايام) da hatine afirandin. Wekî din li gor ayeta Fussilet 41/9-10an dinya di nav du rojan da hatîye afirandin, ji bo temambûna pîvanên xwarinan du rojên din jî lê hatîye zêdekirin ku li ser hev dibin çar roj. Asîmanê ku di halê dûmanê da jî di du rojan da hatine afirandin (Fussilet 41/11-12).

Ji alimên tefsîrê yên serdema ewil hinekan îfadeya "sittete eyyam"ê wekî şeş rojên hefteyê şirove kirine (Teberî, 2001, r. 1/464; Qurtubî, 2006, r. 17/7). Hinekên din ji ber ayetên Secde 32/5 û Hec 22/47an gotine ku her rojek, beramberî hezar salên me ye (Îbn Ebî Hatim, 1997, r. 5/1496, 6/1925, 2004, 8/2714). Hin aliman jî ev weha mane kirine: Meqsed ji vê gotinê, ne ku her tişt di vê maweyê da hatîye afirandin. Berevajîyê vê, Xwedê di wan rojan da dest bi afirandina eslê heyînan kirîye. Lêbelê ev nayê wê maneyê ku ev kar temam bûye, lewra pêvajoya afirandinê karekî gelekî dirêj e (Maturîdî, 2005, r. 14/334-335). Dîyar e ku berî afirandina erd û asîmanan roj û heyv tune bû (Faxreddîn er-Razî, 1981, r. 25/184), loma hin aliman gotine ku meqsed ji vê gotinê, ne rojên me yên dinyayê ne; ev "şeş wext in" an bi qasî "wexta şeş rojan" e (Beydawî, 2000, r. 1/547).

Li gor ayetên Re'd 13/2 û Loqman 31/10an Xwedê, asîman bilind kirine. Îfadeya (بِغَيْرِ عَمَدٍ تَرَوْنَهَا) bi du awayan hatîye manekirin. Bêyî stûnên ku meriv bikare wan bibîne. An jî stûn hene lê nayên dîtin (Ferra, 1983, r. 2/57). Li ser rûyê erdê çîyayên binecih çê kirine. Ev yek bi peyva "rewasî"yê hatîye îfadekirin. Ev, pirhejmara "rasîye"yê ye. Ji

ayetên Fussilet 41/10; Murselat 77/27; Nazi'at 79/32yan tê famkirin ku ev peyv di Qur'anê da bi maneya çîya hatîye bikaranîn.

Di gelek ayetan hatîye destnîşankirin ku asîman, heft qat in (Beqere 2/29; Îsra 17/44; Mu'minûn 23/86; Fussilet 41/12; Telaq 65/12; Mulk 67/3; Nûh 71/15; Nebe' 78/12). Xwedê, erd di şiklê kureyê da û mînanî asîmanê heftqat afirandîye (Telaq 65/12). Lewra "misl" (مثل) ew e ku di nimûnebûn, pîvan û xusûsîyetên din da û heta di maneyê da tiştek şibhê tiştekî din be (Xelîl, 2003, r. 4/118). Loma hin aliman gotine ku divê erd jî wekî asîmanan heft qat be (Maturîdî, 2005, r. 15/244).

### 2.2. Afirandina Cinan-Milyaketan

Cin berî însanan hatine afirandin. Xwedê, cin ne kirine şahidê afirandina erd û asîmanan ne jî şahidê afirandina wan bi xwe (Kehf 18/51). Di ayeta Hicr 15/27an da tê vegotin ku cin -hîn berî afirandina Adem- ji "agirê bijehr", li gor ayeteke din ew jî "têkeleke ji agir" hatine afirandin (Rehman 55/15). Di çend ayetan da ev yek cih digire ku Îblîs ji "agir" hatîye afirandin (E'raf 7/12; Sad 38/76).

Em ji ayeta Zarîyat 51/56an têdigihîjin ku cin jî ji îmtihanê berpirs in. Însan bi organên hiskirinê tên hiskirin, lêbelê cin nayên dîtin (Teberî, 2001, r. 1/539, 542-543). Loma di ayeta Saffat 37/158an da ji bo milyaketan peyva "el-cinnet" hatîye bikaranîn (Qurtubî, 2006, r. 1/440).

Li alîyê din ji ber ayeta Kehf 18/50î hin aliman gotine ku "Îblîs" ne milyaket, cin e (Teberî, 2001, r. 1/540-541; Zeccac, 1998, r. 1/113). Lêbelê di ayetên Beqere 2/34; E'raf 7/11; Hicr 15/31; Îsra 17/61; Kehf 18/50; Taha 20/116; Sebe' 34/20 û Sad 38/74an da Îblîs ji milyaketan tê îstîsnakirin. Ev yek nîşan dide ku ew jî milyaket e (Teberî, 2001, r. 1/535-536; Zeccac, 1998, r. 1/114). Jixwe li gor hin aliman peyva "melaike"yê ji koka "leeke"yê (ألك) hatîye darişţin ku tê maneya meriv yekî bi qasidî bişîne (Qurtubî, 2006, r. 1/393).

Ji xeynî Cebraîl û Mikaîl di Qur'anê da navê milyaketên din cih nagire (Beqere 2/98). Bi tenê behsa hin wezîfeyên wan tê kirin. Milyaketê wehîyê Cebraîl wekî Cîbrîl, milyaketê berpirsê rûdanên siruştî Mikaîl jî wekî Mîkal cih digire (Teberî, 2001, r. 1/292). Li gor ayetên En'am 6/61; Nehl 16/28-32 û Secde 32/11an milyaketên ku wezîfeya wan standina ruhê însanan e ji yekî zêdetir in. Ji wan ra "meleku'l-mewt" tê gotin. Lêbelê bawerîyeke wisa di nav gel da heye ku milyaketekî bi tenê yê ruhstîn ê bi navê Ezraîl heye. Ev bêje di Qur'ana Pîroz û hedîsên sehîh da cih nagire. Îhtimal e ku ev bêje îbranî be û bi tesîra kesên bi navê Kabê el-Ehbar (w. 32/652-653) û Wehbê kurê Munebbihê (w. 114/732) -ku berê cihû bûne û piştra bûne misilman- derbasî berhemên îslamê bûbe. Lewra di berhemên alimên cihûyan da navên zêdetirî deh milyaketên ruhstîn cih digirin, ji van yek jî "Azrael" e (Kılavuz, 1991, r. 4/350).

Ji bo hinekên din "muqerreb" hatîye gotin. Ew çavdêrîya "Îlliyûn"ê dikin ku tê da qeydên kesên qenc tên parastin (Muteffifîn 83/21). Di hin ayetên din da behsa wan milyaketan tê kirin ku wezîfedar in bi rêvebirina cehenemê (Zumer 39/71-72; Mu'min 40/49-50; Zuxruf 43/77; Mulk 67/8; Muddessir 74/30-31). Navê wan di ayetekê da wekî "zebanî" ('Eleq 96/18) cih digire. Li gor ayetên Muddessir 74/30-31ê ev nozdeh milyaket

in. Herweha behsa heşt milyaketan tê kirin ku dê roja qîyametê 'erşê Xwedê hilgirin (Haqqe 69/17).

**2.3. Afirandina Adem û Jina wî:**

Li gor ayeta Beqere 2/30î Xwedê, rojekê ji milyaketan ra dibêje ku ez li ser rûyê erdê xelîfeyekî çê dikim. Milyaket jî dibêjin: Ma tu heyînekî çê dikî ku dê li wê derê xerabkarîyê bike û xwînê birijîne? Li ser vê, Xwedê dibêje ku bi tiştên hûn nizanin, ez dizanim! Li alîyê din em ji ayeta Sad 38/69an têdigihîjin piştî ku Xwedê vê gotinê dibêje, li "Meleyê E'la"yê anku di navbera civaka herî payebilind a milyaketan da nakokî derdikeve (Teberî, 2001, r. 14/65-66; Qurtubî, 2006, r. 18/236).

Ayetên Hicr 15/28 û 33an radigihînin ku Adem aleyhiselam yekem beşer e ku hatîye afirandin (Zeccac, 1998, r. 2/321). Loma ji Adem ra bi maneya bavê beşeran "ebu'l-beşer" hatîye gotin (Qurtubî, 2006, r. 1/416). Ji bo alîyê derve yê laşê însanan anku ji bo çermê wî "beşere" tê gotin (Xelîl, 2003, r. 1/140). Peyva "beşer"ê di Qur'anê da bi maneya însan tê bikaranîn û pê cudahîya fizîkî ya însanan a ji candarên din tê destnîşankirin.

Di ayeta Alî Îmran 3/59an da tê gotin ku Xwedê Adem ji "ax"ê afirandîye. Di ayeteke din tê vegotin ku wî beşer ji "av"ê afirandîye, jê ra neseb û eqrebatîya zewacê kifş kirîye (Furqan 25/54). Li gor ayeta E'raf 7/12an Adem ji "herî"yê hatîye afirandin. Ev yek di çend ayetên din da jî cih digire (Îsra 17/61; Sad 38/71, 76).

Madeya ku Adem jê hatîye afirandina di ayeta Saffat 37/11an da wekî "herîyeke mizeloqî", di hin ayetên din da wekî "herîya ziwabûyî, ji herîreşka bêhnketî" (Hicr 15/26, 28, 33), li cihekî jî wekî "herîyeke mîna dîzika ziwabûyî" (Rehman 55/14) hatîye wesifandin. Li alîyê din di ayeta Secde 32/7an da tê gotin ku Xwedê bi herîyê dest bi afirandina însan kirîye. Bêjeya "însan" îsmê cins anku hevenav e. Hem ji bo yekhejmarê hem jî ji bo pirhejmarê tê bikaranîn. Lêbelê tê gotin ku li vir Adem destnîşan dike (Zeccac, 1998, r. 4/204-205). Ji ayeta Secde 32/8an tê famkirin ku Hewa jî ji herîyê hatîye afirandin. Lewra di wê ayetê da tê gotin ku zuryeta însanan "ji haveynekî, ji aveke lawaz" hatîye afirandin. Jixwe Xwedê bi awayekî zelal vegotîye ku însan, ji jin û mêrekî çê bûne (Nîsa 4/1; Hucurat 49/13). Em dizanin çêbûna xwarinên ku em dixwin, bi tevlihevbûna av û axê ra eleqedar e. Ji ber vê yekê ne tenê Adem û Hewwa, madeya sereke ya ku însan jê çê dibe "herî" ye.

Piştî ku dirûvê Adem yê dawî tê dayîn Xwedê ji ruhê xwe pif dikê (Hicr 15/29; Sad 38/72). Di ayeta Beqere 2/31-33an da tê ragihandin ku Xwedê, navê her tiştî hînî Adem aleyhiselam kirine. Ha ew ruhê ku bû sedema secdebirina milyaketan, ew agahîya ji îlmê Xwedê bixwe ye ku hînî Adem aleyhiselam kirîye.

## 3. MIQAYESEKIRIN

Di hin sebeqeyan da (ZM.II: 4-6.) ku bi destpêka afirandinê ra eleqedar in peyvên "behr", "mîr", "text", "dur" û "muhbet"ê cih digirin (Reşo, 2004, r. 1/161-162). Li gor hin sebeqeyan (HBB: 3-4.) Xwedê nûr e û ji nûra ku jê derdikeve cara ewil dur çê dibe (Reşo, 2004, r. 1/259). Lê ji hin sebeqeyên (BE: 1-3.) din dîyar dibe hîn berî ku alem bê afirandin Xwedayê ku nûr e, xwe di nav durê da veşartibû. Wî xwe nas dikir, di serî da jê muhebet çê bû û ji ber ku tu mewcûdat tune bû, wî xwe diperest (Reşo, 2004, r.

1/234-235; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 128). Xwedê durê ji xwe cihê dike û paşê lê dike nezer. Wisa dîyar (ZM.II: 12-14.) dibe ku heybeta vê nezerê li durê pir giran tê û nikare wê hilgire, loma bi rengên wekî spî, sor û zer dixemile. Wê hingê hîn erd û asîman û 'erş nehatine afirandin (Reşo, 2004, r. 1/162-163; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 100-101).

Meseleya ku Xwedê durê ji xwe cihê dike di çend sebeqeyên din da jî (QŞ.I: 4; QŞ.II: 4.) cih digire (Reşo, 2004, r. 1/185, 191; Kreyenbroek, 1995, r. 208). Meriv dikare wisa hizir bike ku dur paçeyekî ji Xweda ye, her du ji ewil ve bi hev ra bûn û yek ne berî yê din. Lêbelê ev îfade dikare weha jî bê xwendin: "ji xwe çê kir". Wê gavê "dur" bi gotina Xwedê çê bûye. Jixwe ev yek bi zelalî di sebeqeyeke din da (ZM.II: 12.) cih digire (Reşo, 2004, r. 1/162). Herweha tê gotin (QŞ.I: 6.) ku dur ji eserê gotina Padşa hatîye meydanê (Kreyenbroek, 1995, r. 208). Dîsa tê gotin (BE: 5-6.) ku "dura beyza" ji alîyê Xwedê ve hatîye afirandin (Reşo, 2004, r. 1/235; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 128).

Xemilîn û geşbûna durê ya bi gelek rengan wekî îşareta bo çêbûna milyaketan hatîye destnîşankirin (Reşo, 2004, r. 1/153). Sebeqeyên (ZB.I: 12.) ku behsa muhebet û sohbeta Xwedê dikin jî piştrastîya vê nêrînê dikin (Reşo, 2004, r. 1/153; Kreyenbroek, 1995, r. 172). Lewra meriv bi tena serê xwe suhbetê nake. Ev jî tê wê maneyê ku hin kesên din jî li wê suhbetê hazir bûne (Reşo, 2004, r. 1/153). Jixwe di hin sebeqeyên din da jî (ZM.II: 15.) qala suhbet û muhebetê tê kirin. Ev, wekî şêwra Xwedê ya bi milyaketan ra tê qebûlkirin ku dê rê û rêzikên çawa dayînin û bi gelemperî gerdûneke çawa ava bikin (Reşo, 2004, r. 1/163, T'êmûrê Meso, 2018, r. 66).

Bi vegotina qewlekî (ZB.II: 38.) esasê afirandina alemê roja şemîyê hatîye danîn û roja înîyê xilas bûye (Reşo, 2004, r. 1/166; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 103). Lê di sebeqeyeke din da (QM: 9.) behsa wê yekê tê kirin ku karê afirandinê roja yekşembê dest pê kirîye (Reşo, 2004, r. 1/264). Wê gavê jî ev, bi hin sebeqeyên din ra (AD: 29.) li hev nakin ku esasê vî karî roja înîyê hatîye danîn, şembîyê hûrgilî hatine dîyarkirin û roja çarşemê bi dawî bûye (Kreyenbroek, 1995, r. 188; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 120). Ev roja ku bi meha nîsanê ra tê girêdan wekî roja cejna milyaketan tê wesifandin (QN: 15.) (T'êmûrê Meso, 2018, r. 79).

Li alîyê din peyva durê pirî caran wekî "beyza" tê wesifandin ku tê maneya spî. Tê gotin ku ev reng, semboleke wisa ye ku puxteya hemû rengan di nav xwe da dihewîne. Gelek rûdanên ku dê paşê fizîkî biqewminin bi vê peyvê ve tên girêdan. Ev jî dike ku meriv wisa bifikire ku ew di ezelê da wekî îmkanîyet di "dur"ê da ne û paşê derketine alema zuhûrê (Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 56). Jixwe "zuhûr" an jî "tezahur" ji bo wî tiştî tê gotin ku ji ezel ve heye, lê paşê şiklê xwe yî madî digire yan jî wekî ku tê gotin dadikeve ser rûyê erdê (Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 57). Lewra li gor bîr û bawerîya wan alemeke xeynî madeyî hebû. Xuyabûn û tecelîya wan paşê çê bûye (Omerxalî & Xankî, 2009, r. 51; Omerxalî, 2017, r. 110). Dikare bê gotin ku nûra îlahî, puxteya milyaket û alemê pêk tîne. Lêbelê wisa tê famkirin ku ev nûr ne ji tunebûnê hatîye çêkirin, berevajîyê vê Xwedê ew ji zatê xwe cihê kirîye. Ev yek bîr û bawerîya wehdeta wicûdê û hulûlê tîne bîra meriv (Kaplan, 2013, r. 81).

Li alîyê din li gor ayetên Qur'anê afirandina erdê du rojan, çêbûna çil û çîyayan û kifşkirina pîvanên xwarinan çar rojan, afirandina asîmanan jî du rojan kişandîye. Heke

ev di wextên cuda da bûna, divê afirandinê bi tevahî heşt rojan bikişanda, lêbelê Xwedê dibêje ku wî erd û asîman û her tiştê di navbera wan da bi tevahî di şeş rojan da afirandine (E'raf 7/54; Yûnus 10/3; Hûd 11/7; Furqan 25/59; Secde 32/4; Qaf 50/38; Hedîd 57/4). Ji ber vê yekê wisa tê famkirin ku hin qonaxên di ayetan da qala wan tê kirin, di heman demê da bûne. Bi gotineke din ji "teqîn"a ku destpêka afirandinê ye (Enbîya 21/30) bigire heta ku li ser halê xwe yê dawî edilîye (Beqere 2/22) rûyê erdê di gelek qonaxan ra derbas bûye. Gava meriv li ayetên têkildar binêre, fam dike ku ev yek mîna wexta şixlê sereke yê însaetê ye. Lewra gava tîrêjên rojê (duha) yên can didin siruştê derketin holê û tarî û ronî çê bû (En'am 6/1), ji bo ku qalikê erdê neşiqite çîya li ser hatine edilandin; çem, gelî û rê hatine çêkirin û herweha nebat û candar li ser rûyê erdê hatine bicihkirin (Nazi'at 79/27-33; Nehl 16/15; Enbîya 21/31; Loqman 31/10).

Îblîs ji wan cinan e ku ji alîyê Xwedê ve hatine wezîfedarkirin. Di rîwayetan tefsîrê da navê wî wekî "'Ezazîl" û "Haris" cih digire (Qurtubî, 2006, r. 1/438-439). Ayetên E'raf 7/11-13 û Sad 38/69-78an delîla vê yekê ne ku - berî afirandina Adem- Îblîs jî li "Meleyê E'la"yê wezîfedar bûye. Îfadeya *"Îblîs ji wan cinan bû"* (Kehf 18/50), vê ravekirinê piştrast dike. Lewra di destpêka ayetê da emir bi tenê ji milyaketan ra hatîye dayîn. Heke cin ne ji milyaketan bûna, wê demê emrê Xwedê yê secdebirinê yê ji bo milyaketan dê Îblîs di nav xwe da nehewanda (Teberî, 2001, r. 1/538; Zeccac, 1998, r. 1/114).

Em ji qewlan fam dikin ku li ser meseleya hejmara milyaketên mezin ên nemir tifaq heye ku ew heft in. Lêbelê li ser navê wan hin nakokî hene. Berevajîyê vê ji xeynî Cebraîl û Mikaîl di Qur'anê da navên milyaketên din cih nagirin. Herweha ji ayeta Sad 38/79an tê famkirin ku milyaket mexlûqên temendirêj in û ji bo hinekan destûr hatîye dayîn ku heta roja vejînê bijîn.

Di qewlan da behsa wan madeyan tê kirin ku Adem jê çê bûye. Lêbelê di heqê made yan jî madeyên ku Hewa jê çê bûye tu agahî nayê dayîn. Navê Adem û Hewayê di gelek sebeqeyan da (EB: 10; QÎ: 4; QS: 7-8.) bi hev ra derbas dibin (Reşo, 2004, r. 1/248, 386; Kreyenbroek & Reşow, 2011, r. 150) û tê gotin (HYN: 1.) ku Adem bi Hewa ra zewicîye (Reşo, 2004, r. 1/213). Ji qewlan tê famkirin ku piştî ruh dikeve qalibê Adem milyaket wî dibin cenetê. Lêbelê bi zelalî behsa wê yekê nayê kirin ka çima ji wir hatîye derxistin. Herweha tê gotin ku heftê û du milet ji wan çê bûne. Digel vê -herçiqas hûrgilî ne dîyar bin jî- behsa Şedîh Pêxember tê kirin û Horiya ku ji bo wî hatîye hinartin.

Li alîyê din li gor vegotinên Qur'anê jî ji bo her însanî du nefs hene. Ya ewil bedena wî, ya duduyan jî ruhê wî ye. Ayeta Tekwîr 81/7an radigihîne ku ev dê roja vejînê careke din bigihîjin hev û bibin cot (Teberî, 2001, r. 24/144). Di rîwayetên tefsîrê da tê gotin ku Hewa ji parsûya Adem a alîyê çepê çê bûye (Qurtubî, 2006, r. 1/449). Lêbelê li gor hin ayetan Adem û Hewa, mîna însanên din ji "nefs"ekê hatine afirandin. Lewra di ayeta Nîsa 4/1ê da terkîba "nefsin wahidetin"ê cih digire ku navdêrekî nedîyar e. Ji ber vê yekê cînavka "ha"yê ya di "minha"yê da jî ya ku nefsa wahideyê îşaret dike, nefsa wahîdeyeke din nîşan dide. Anku hem Adem hem jî Hewa di nav axê da ji "nefsa wahide" hatine afirandin û piştra zuryeta însanan ji wan zêde bûne. Ev yek di ayetên En'am 6/98; E'raf 7/189 û Zumer 39/6an da jî cih digire. Li gor vê, axê ji bo Adem û jina wî wezîfeya malzarokê anîye cih (Mu'minûn 23/12-14).

Xwedê, Adem li dinyayê afirandîye (Beqere 2/30-31). Cihê ku Adem, jina wî û hemû însanên ji nesla wan lê jîyan û dê roja qîyametê ji nû ve lê bên afirandin, ev der e (E'raf 7/25; Qelem 68/17). Ceneta ku Adem û jina xwe ketinê baxçeyekî li dinyayê ye, ne ceneta li axretê ye. Lewra ceneta li axretê ne cihê îmtihanê ye, bereksê vê cihekî wisa ye ku dê wekî xelat bê dayîn ji bo kesên ku di îmtihanê da bi ser ketine (Alî Îmran 3/15; Qelem 68/34; Beyyine 98/7-8). Jixwe di zimanê erebî da ji bo wan baxçeyan cenet tê gotin ku bi dar û hêşînahîyan hatine nixumandin (Raxib el-Îsfehanî, 2002, r. ٩٨; Qurtubî, 2006, r. 1/359). Li gor ayeta Taha 20/118an heta ku ew di wî baxçeyî da bûna, ne dê zehmetî bikişandina ne jî dê birçî û tazî bimana.

## ENCAM

Agahîyên ku di qewlan da li ser afirandinê tên dayîn kurt in. Behsa hûrgilîyan pir nayê kirin. Ew afirandinê bi rengekî ji rengî sidûrê şirove dikin. Li gor vê berî afirandinê alemeke xeynî madeyî hebû, tecelîya wan paşê çê bûye. Bi bîr û bawerîya wan, alem û însan ji eynî haveynî ne, her tişt ji heman çavkanîyê derketîye û loma bi wan ra nûra îlahî heye. Ev yek, wê fikra kevnar ku di çanda misilmanan da wekî heqîqeta Muhemmedî yan jî nûra Muhemmedî tê zanîn, tîne hişê meriv.

Meriv ji hin sebeqeyan wisa têdigihîje ku Xwedê bixwe bi kar û barê afirandina alemê û Adem ve mijûl bûye. Lêbelê li hin cihên din behsa rola heft milyaketan tê kirin. Loma wisa tê hizirkirin ku Xwedê bi meseleyên li ser rûyê ji dûr ve eleqedar e û ev kar spartîye milyaketên ku alîkarê wî ne. Ji ber ku qewl di serê ewil da nehatine nivîsandin û bêtir bi devkî hatine neqilkirin di navbera wan da hin cudahî hene. Meriv dikare bibêje ku di van meseleyan da di navbera qewlan da hin nakokî hene: Çêbûn an jî hebûna "dur"ê, nav û hejmara milyaketan, madeyên ku Adem jê çû bûye, zêdebûna nesla Adem û Hewayê û maweya çêbûna alemê û ya Adem.

Di qewlan da hejmarên wekî çar yar, çar kenar, çar sefer, heft sur, heft milyaket, heft tebeqe erd, heft tebeqe asîman, çil sal, heftê û du, hijdeh hezar, heft sed sal, not û neh reng û not hezar sal derbas dibin. Dîyar e ku hin ji van hejmaran sembol in û eleqeya van bi hin bîr û bawerîyên din ra heye. Ji bo zelalkirina vê yekê hewcedarî bi xebatên berfirehtir heye. Li alîyê din di gelek ayetan da tê ragihandin ku erd û asîman û hemû tiştên di navbera wan da di "şeş rojan" da hatine afirandin. Ev yek bi çend awayên cuda hatîye şirovekirin. Madeya sereke ya ku cin jê hatine afirandin "agir" e. Milyaket navê wan cinan e ku ji alîyê Xwedê ve hatine wezîfedarkirin. Însan, ji jin û mêrekî zêde bûne. Anku hemû meriv ji nesla Adem aleyhiselam û jina wî Hewayê çê bûne. Rêzdarîya wan wekî hev e. Anku ji alîyê nesebê ve tu kes ne raserî kesekî din e.

Meriv dikare xalên hevpar û yên cihêwaz di navbera her du vegotinan da weha vebêje: Li gor qewlan berê alem tune bû, paşê hatîye çêkirin. Qur'an jî vê yekê disepîne. Lêbelê li ser awayê çêbûn û zêdebûna tiştan di navbera wan da cudahîyeke mezin heye. Di qewlan da li ser mijara afirandinê roleke giring bo "heft suran" an jî "heft milyaketan" û hin tiştên din tê dayîn. Digel vê bi awayekî zelal nayê famkirin ka gelo milyaket kengî hatine xuliqandin. Lêbelê di Qur'anê da afirandin wekî karê Xwedê tê pêşkêşkirin û tê gotin ku ew piştî afirandina erd û asîmanan hatine xuliqandin. Li gor bîr û bawerîya wan milyaket nemir in. Lêbelê Qur'an vê yekê bi tenê ji bo Xwedê disepîne. Li gor qewlan Adem li dinyayê hatîye xuliqandin û paşê ew birine cenetê. Lêbelê behsa awayê çêbûna

jina wî nayê kirin. Herweha bêsebrîya wî wekî sedema derxistina wî ya ji cenetê tê nîşandan. Berevajî vê li gor ku em ji ayetên Qur'anê serwext dibin hem ew hem jî jina wî li dinyayê hatine afirandin û li baxçeyekî li wir hatine bicihkirin, lêbelê piştî ku herdu jî ji dara qedexekirî dixwin ji wir tên derxistin.

## ÇAVKANÎ


- Ahmet, S. K. (1991) "Azrail", *DİA*, 4/350-351.
- Batu, N. H. (2024) *Mîtosa Afirandinê di Rîwayetên Kurdên Êzidî û Yarsan de*. Mêrdîn: Teza Lîsansa Bilind Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên li Tirkîyeyê.
- Beydawî, 'E. b. 'U. (2000) *Enwaru't-Tenzîl we Esraru't-Te'wîl* (3 cild). Beyrût- Dimeşq: Daru'r-Reşîd.
- Can, Ş. (2011) *Klasik Yunan Mitolojisi*. İstanbul: Ötiken Neşriyat.
- Eliade, M. (2001) *Mitlerin Özellikleri*. Wergêr: Sema Rifat. İstanbul: Om Kuram Yayınevi.
- Eliade, M. (2003) *Dinsel İnançlar ve Düşünceler Tarihi: Taş Devrinden Eleusis Mysteria'larına*. Wergêr: Ali Berktay. İstanbul: Kabalcı.
- Faxreddîn er-Razî, M. b. 'U. (1981) *Mefatîhu'l-Xeyb* (32 cild). Beyrût: Daru'l-Fikir.
- Ferra, Y. b. Z. (1983) *Me'ani'l-Qur'an* (3 cild). Beyrût: 'Alemu'l-Kutub.
- Guest, J. S. (2007) *Yezidilerin Tarihi Melekê Tawus ve Mıshefa Reş'in İzinde*. Wergêr: İbrahim Bingöl. İstanbul: Avesta.
- Îbn Ebî Hatim, 'E. b. M. (1997) *Tefsîru'l-Qur'ani'l-'Ezîm Musneden 'en Resûli'l-Allah we's-Sehabeti we't-Tabi'în* (10 cild). Mekke: Mektebetu Nizar Mustefa el-Baz.
- Kaplan, Y. (2013) *Günümüz Yeziddiliği*. İstanbul: Nûbihar.
- Kreyenbroek, P. G. & Reşow, X.C. (2011) *Tanrı ve Şeyh Adi Kusursuzdur Yezidi Tarihinden Kutsal Şiirler ve Dinsel Anlatılar*. Wergêr: İbrahim Bingöl. İstanbul: Avesta.
- Kreyenbroek, P. G. (1995) *Yezidism- Its Background, Observances and Textual Tradition*. New York: The Edwin Mellen Press.
- Lescot, R. (2014) *Yezidiler Din Tarih ve Toplumsal Hayat Cebel Sincar ve Suriye Yezidileri*. İstanbul: Avesta.
- Maturîdî, M. b. M. (2005) *Te'wîlatu'l-Qur'an* (18 cild). İstanbul: Mizan Yayınevi.
- Muqatil, b. S. (2002) *Tefsîru Muqatil b. Suleyman* (5 cild). Beyrût: Muessesetu't-Tarîxi'l-'Erebî.
- Omerxalî, X. & Xankî, K. (2009) *Analîza Qewlên Ezdiyan*. İstanbul: Avesta.
- Omerxalî, X. (2017) *Kevneşopa Êzdiyatiyê ya Tekstuel a Dînî: Ji ya Devkî bo ya Nivîskî*. Wergêr: Fahriye Adsay. İstanbul: Avesta.
- Qurtubî, M. b. A. (2006) *el-Cami' li Ehkami'l-Qur'an* (24 cild). Beyrût: Muessesetu'r-Risale.
- Raxib el-Îsfehanî, H. b. M. (2002) *Mufredatu Elfazi'l-Qur'an*. Dimeşq: Daru'l-Qelem.
- Reşo, X.C. (2004) *Perin ji Edebê Dînê Êzdîyan*. Duhok: Spîrêz.
- Silêman, P. X. (2001) "Milyaket di Baweriya Êzîdiyan de - Liber Ronahiya Tekistên Êzîdiyan". *Dengê Êzîdiyan*. Hejmar 8+9/116-122.
- T'êmûrê Meso. (2018) *Newşe Dînê Êzîdiyan*.
- Teberî, M. b. C. (2001) *Cami'u'l-Beyan 'en Te'wîli Ayi'l-Qur'an* (25 cild). Qahire: Merkezu'l-Buhûs we'd-Dirasati'l-'Erebîyye we'l-Îslamîyye Daru Hecr.
- Xelîl, b. E. F. (2003) *Kitabu'l-'Eyn* (4 cild). Beyrût: Daru'l-Kutubi'l-Îlmîyye.
- Zeccac, Î. (1998) *Me'ani'l-Qur'an we Î'rabuhu* (5 cild). Beyrût: 'Alemu'l-Kutub

**Özet**

Yaratılışa dair anlatılar Yezidilerin birçok Qawlinde yer alır. Bu Qawillerin bazıları doğrudan yaratılışı konu edinmektedir. Yaratılışın başlangıcıyla ilgili birtakım meseleler ise diğer bazı Qawillerde geçmektedir. Yaratılış konusuna "Mishefa Reş" adlı kitapta da yer almaktadır. Ancak değişik nedenlerden dolayı birçok araştırmacı, bunun Yezidilere ait orijinal bir kitap olmadığı düşüncesinde hemfikirdirler. Bu sebeple biz bu çalışmamızda onların ilahi bir temeli olduğuna inandıkları yaratılışla ilgili "qawl"lerini esas aldık. Göklerin, yerin, cin-meleklerin ve ilk insanın yaratılışı Kur'ân-ı Kerim'in birçok âyetinde de detaylı olarak anlatılmaktadır. Bu çalışmamızda göklerini yerin, cinler ile meleklerin ve ilk insan ile eşinin yaratılması konuları incelecektir. Herhangi bir tarafa eleştirmede bulunmaksızın aynı zamanda doğru veya yanlış yargısında bulunmaksızın bu konular Yezidilerin Qawil'leri çerçevesinde Kur'ân-ı Kerim'deki anlatımlarla karşılaştırılacaktır.

**Anahtar Kelimeler:** *Mitos, Yaratılış, Qewl, Kur'ân, Karşılaştırma.*

## Comparison of the Creation Myth of the Yazidis with the Holy Qur'an

**Abstract**

Narratives about creation are found in many Qawls of the Yazidis. Some of these Qawls directly deal with creation. Some issues about the beginning of creation are mentioned in some other Qawls. The subject of creation is also mentioned in the book called "Mishefa Reş". However, for various reasons, many researchers agree that this is not an original book of the Yazidis. For this reason, in this study, we have taken as basis their "qawls" about creation, which they believe to have a divine basis. The creation of the heavens, the earth, the jinn and angels, and the first man are also explained in detail in many verses of the Qur'an. In this study, the creation of the heavens, the earth, the jinn and angels, and the first man and his wife will be examined. Without criticizing any side and without making any judgments about whether it is right or wrong, these issues will be compared with the narrations in the Holy Qur'an within the framework of the Qawls of the Yazidis.

**Keywords:** *Myth, Creation, Qawl, Qur'an, Comparison.*

نەهەمین کۆنفرانسێ زانستییێ ناڤدەولەتییێ

سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

ئەفسانەیا کوردی

ئەدەب، زمان، دیرۆك و جڤاك

٢٢-٢٣ێ نیسانا ٢٠٢٥ێ

المؤتمر الدولي العلمي التاسع لمركز الدراسات الكُردية

الأسطورة الكُردية

الأدب، اللغة، التاريخ والمجتمع

٢٢-٢٣ نيسان ٢٠٢٥

نهمين كنفرانس علمى بين المللى مركز مطالعات كردى زاخو

افسانه‌هاى كردى

ادبيات، زبان، تاريخ و جامعه

٢٢ - ٢٣ آوريل ٢٠٢٥

# سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی


| | |
|---|---|
| پەرتووك | **ئەفسانەیا کوردی**<br>**ئەدەب، زمان، دیرۆك و جڤاك** |
| ژ نڤیسینا | کۆمەکا ڤەکۆلەران |
| بەرك | بەرگێ ئێکێ ٢٠٢٥ |
| دەستەکا دیزاینێ | دلــژین شــەریف یوسـف<br>ئـامـەد موحەمەد عەبدوللا<br>رانیا عەبدولرەزاق موحەمەد<br>هێلان تـەوفیق ئیسمـاعیل<br>هـێژا فــاخــر سەعید<br>دلــژین مـستەفا یوسف |
| سەرپەرشتییا دیزاینێ و بەرگ | وارهــێـل عـەبدولـبـاقی<br>شــرین غــەریب ســالــح |
| رێکخەر | پـالـە عـیسـا |
| ISBN | ٩٧٨- ٩٩٢٢- ٦٦١- ٦٣- ٠ |
| ژمارەیا سپاردنێ | ٢٥ \ ٢٦٠٤ \ D- |

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی



© مافێ چاپێ یێ پاراستیە بۆ
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی



zcks@uoz.edu.krd +964 (0) 751 536 1550
Iraq-Kurdistan Region, Zakho- Univesity of Zakho